# Destana min

Rêber Hebûn



Helbest

ZANYAR

***Rêber Hebûn**

# Destana min

**Helbest**

RÊBER HEBÛN

**DESTANA MIN**

**HELBEST**

Çapa yekem

*Weşanên kombûna zanyarên azad*

**Whatsapp: 004915750867809**

***https://reberhebun.wordpress.com/***

*hejmara çapê:99- 07.12.2024*

*ISBN: 978-91-89288-90-4*

**Çi tiştê di vê pirtûkê de, nerîn,raman û bawerî girêdayî daner e, hemî maf ji daner re parastî ne, çênabe pirtûk bête çapkirin hinekî an hemî bê erêkirina malxaneyê an erêkirina nivîskar.**

**Hemî maf ji daner re parastî ne**

# NAVEROK


-Diyarî------------------------------------------------------------6
-Xewin------------------------------------------------------------7
-Azadî -----------------------------------------------------------8
-Çavên kesk-----------------------------------------------------9
-Çavên te Kurdistan e-------------------------------------------10
-Cîhanek Azad--------------------------------------------------12
-Dawiya axînê---------------------------------------------------14
-Dengê te--------------------------------------------------------15
-Destanek e mîdî-----------------------------------------------17
-Dîdara te-------------------------------------------------------18
- Destana min---------------------------------------------------20
-Evîneke rastî----------------------------------------------------23
-Ew rewan sax bike-------------------------------------------24
-Gelê bê kiyan--------------------------------------------------25
-Gotûbêjên dil--------------------------------------------------26
-Ji bilî te--------------------------------------------------------27
-Maçên har-----------------------------------------------------29
-Mêyatiya arî----------------------------------------------------31
-Meyxaneya lêvan---------------------------------------------33
-Keça Kanî-------------------------------------------------------34
-Nû viyanî--------------------------------------------------------35
-Ola dildarî------------------------------------------------------37
-Partîtî------------------------------------------------------------40
-Pêljîn û Pêlvîn--------------------------------------------------41
-Arî ye-------------------------------------------------------------42
-Qêrîneke Gêj-----------------------------------------------------45
-Rêyên xwar------------------------------------------------------47

-Rojiya merd----------------------------------------------------48
-Serxwebûn------------------------------------------------------50
-Tu namirî-------------------------------------------------------51
-Were------------------------------------------------------------52
-Windabûn-------------------------------------------------------53
- Çendîn zor e tu Kurd bî--------------------------------------54
- Pêla demê-----------------------------------------------------56
-Silav Kurdistan-------------------------------------------------58
- Tenê gerdenek im----------------------------------------------61
- Nepeniye gerdûna me-----------------------------------------62
-Çiya li siwara xwe digere--------------------------------------64
-Bi hêvî me-------------------------------------------------------67
-Ez te hildipêçînim----------------------------------------------68
-Ronî be----------------------------------------------------------70
-Ferkera evînê---------------------------------------------------71
-Axaftiekê li ser kenara dînbûnê-----------------------------72
-Dema kovan diaxive-------------------------------------------74
-Domana şewatên serdeman-----------------------------------76
-Dîlanên dema buhirtî-----------------------------------------78
-Sirûda bangên dûr---------------------------------------------80
-Çavsoriyên Qazmeyan-----------------------------------------82
-Guhmasiya hedanê--------------------------------------------84
-Qêrînên di riwê tariyê de--------------------------------------87
-Cîhana min e rehnîbûyî-----------------------------------------88
-Girêka mêyatiyê--------------------------------------------------89
-Li ser sînora evînê----------------------------------------------91
-Wekî ku ez-------------------------------------------------------93
-Li paş demsalan-------------------------------------------------95
-Şiyarbûnek mestbûn------------------------------------------97

-Ji derveyî rehjenê----------------------------------------------99
-Bêhêvî-----------------------------------------------------------100
-Sînga te mirina dilovan e---------------------------------------101
-Efsanek penaberbûyî-------------------------------------------103
-Min te dixwest---------------------------------------------------105
- Namebereke lezgîn û nameyek negîha------------------------107
-Rêwîtiya helimkêşiyê------------------------------------------109
-Dildarî û keder---------------------------------------------------111
-Biyan--------------------------------------------------------------115
-Sirûda gilyazê--------------------------------------------------118
-Sirûda evîna nû-------------------------------------------------120
-Awazekî li ser rayên mirinê------------------------------------121
-Dema helbest berdiaxive---------------------------------------124
-Rêzên perperîkan----------------------------------------------127
-Ji dawî dostikekê re-------------------------------------------129
-Wekî heyranokek evîn-----------------------------------------131
-Hembêza te welatek din e-------------------------------------132
-Tevdandinên dil-----------------------------------------------135
-Kazîna bilûran-------------------------------------------------137
-Babilî ye--------------------------------------------------------138
-Ey hemî binê berfan ji lutkeyan--------------------------------140
-Bibe ji ezmanê min re binbanekî--------------------------------143
-Mirinekî paşxistî-----------------------------------------------147
-Li ber gora rokê------------------------------------------------149
-Tîpa min te niha dibîne-----------------------------------------150
-Kurtejiyana Rêber Hebûn--------------------------------------153

Diyarî :

ji wan kêliyên

ku nema dûbare dibin re

# Xewin

Delalê keça xewinê
Min dûrxîne ji xemê
Min hembêzke bi xurtî
Rêxîne ji bo min bejinê
Tu ji bo min xweş ahengî
Ey şahiya her cejinê
çav û lêva  beybûnê
navnîşana zayînê
hembêza te cîhan e
ji  hêvî  re çelengê
Hezkirina te awaz e
Jiyanê distrînê
ez zindî me bi xweşî
li ser zendê te lê zînê
şopên me wê bimîn in
her zindî ne di jînê

28.07.2021

# Azadî

Bi tirsê em dimînin mîna payîzê
dixapînin buhara xwe li newrozê
di çavên me xwîn û rondik dilorînin
sirûdên me, dimeşiyan li nav tozê
li te ez tim dipirsim lê mîna her car
vedengên min dinalin berve bahozê
pelên xewinan bi peyvên xwe diweşînim
li ber salan dimeşim  ez  li ser dozê
sihên şopên evîndaran dikin fîxan
diparêzin hemû peyman û her sozê
were şad ke bi kenê xwe dilê hêvî
de hew tirsê bi min re bijî dilzîzê
***********
li mêrgên te hemî rewrewk dibin sazî
bi matmayî û dilmestî dikin gazî
evîna har bi te çendîn tijî êş e
perîşan e bi xembarî dilê rizî
welatî tu ji hemî destan û efsanan
cil û bergî ji gul û  darên zer û tazî
berî te azadî xewin e ,niha  dijî
li gel te ey keça çiyan bûye zindî

# Çavên kesk

Min têxe di nav çavên kesk
şînkayî ji derve nîn e
çavên te daristan in
zozanan her diçîne
bajara xewinên sipî
serma têde havîn e
tu ew ezmana dilzar
bi ser min baranan tîne
ji te distînim ronahiyê
bi ser min rehnî dirjîne
tu hemî keçên dilsoz
tu Şîrîn e û tu Zîn e
nêzik be ji min dilzîzê
bend û baskan bişkîn e
hest û peyvên min tu yî
li ber jiyanê zindî ne
zîndan e ew dem bê te
şahiya min axîn e
çavkeska min destên te
li ser destên min hêvî ne
hemî rengên demsalan
hêviyan distrîne
Ew keskahiya balkêş
rengê xwe ji çi distîne?

# Çavên te kurdistan e

Çavên te cêwiyên dilê min in
Gerestêrk in
Di nav wan de jiyanek nû ava dibe
Çavên te pêşeroj in
Newroz in
Nû roj in
Di çavên min de
buxçeyên tîrêjan av didin
Ez ji wan hez dikim
Bi wan sond dixum
Bin sihên wana dimeşim
Li ber wan
hevokên min dixwişin
Çavên te Efrîniyê
Dişînin azadiyê
Li wargehên ronahiyê
Min ji xemxwariyê rût dikin
ji azariyê rizgar dikin
Min bi evînê dixemilînin
Û sirûştê ji sermayan dûr dixin
Min vexwe avek
Min belav bike
li ser çiyayên singa xwe gulavek
Ez bê te beyar im
Bê liv û gav im
ligel te ez
cîhanek xunav im
ji çavên te werîsên ewrên sipî

dadikevin xwarê
min dorpêç dikin
mîna her carê
çavên te erd û ezman in
Ehrûmezde û Ehrîman in
nakokiyan li dor maseyekê dicivînin
mirinê dixapînin
xewinan dibarînin
xemgîniyan dibrêjin
keseran diqelînin
ziravên tirsê diqetînin
radestbûnê napejirînin
çavên te çira ne
tiştên geş man e
ax û ban e
kurdistan e

# Cîhanek azad

Heta dawiya vê jînê
wê xemgînî, bijî ji bo me
ji ber jiyan ,ne seyran e
lê êş û vîn û raman e
emê her xewina xwe bigrin
mîna pirtûkek e rizî
dinale li ser zemînê şil
emê bijîn bi dilşadî
di nav şêniya payîzê
emê sêdara ahînê
bisotînin
bi hêrsa peyv û hestên xwe
çira kin bîranînên xwe
nebe mîvanê bilûran
nebe leylanek e rêwî
bibe ezman û balinde
biweşîne ji singê xwe
keriyên keskesorên mest
evîna me bedewbûn e
dirêxîne çiyayên şîn
disojînê demên bêbext
disekinê mîna destpêkê
li ber dawiya nûhatî
evîn nîgaşeke gewre
li hember jînek e dijwar
serê xwe natewîne tim
bi derbasbûna dîrokê
bi çûyîna demên şîrîn

li bendê min nemîne qet
ji ber ez zindî me her car
di her tiştê ku jiyanê
vejîn kir mîna adarê
tenahî cîgehek zîz e
di nav de xemgînî şad e
cîhanek nû û azad e
emê têde jiyana xwe bikin awaz
û geh helbest
heta hêvî bijî serbest

# Dawiya axînê

Tu vîna her hêzêyî
Pîvana her nirxêyî
Jîn û gav û armancî
Êzinga şoreşê yî
Gavên min her li pêş in
Ji ber tu tîrêja rêyî
Ji ber tu giyanî yarê
Şahiya av û bêyî
Kurdistana biçûkî
Xumxuma şalûlêyî
Tu şînbûna ezmênî
Sipîbûna berfêyî
Erdî ,deryayî û darî
Tu giyana axêyî
Rengî û awazî dilber
Tu ahîna avêyî
Tu her tiştî lê yarê
Naveroka xewinêyî
Her  tu  ji  bo min dermanî
Dawiya axînêyî
29.09.2021
11:16

# Dengê te

Dengê te
xuşxuşa kaniyên cîhanê
Hingiv ji te
mîna hilma Beybûna sipî
dibarin wek baranê
Xweşbûna te
şînbûna darên zivistanê
giyanê
Tu dilek şînî
û ez im ew asîmana vê jiyanê
Herdu lêvên te
nîgaş in
Keskesor in
lê viyanê
Derdixînin şahiya min
rêdixînin kamîranî
Ey ciwanê
wer biweşîne dilê min
payîzek dîn
rengê xwe ji porê te bir
xemla wî bi te tê rewanê
hiş û dil te tev girêda
bi heyîna xwe
xweşzimanê
min bibe bi dengê xwe yarê
min nehêle di nav domanê
ez bi te dîn im keça vîn

bêje min dilber tu kanî?
zehmet e ez te bibînim
bê qepal
porê te dîl e mîna dil
tim dimîne ker û lal
berve roj û meh û salê
lê çirayên dildariyê
her divejîn in bi kenê te
şevên reş
geş dikin lutkeya çiyan
xêz dikin kenên newalê
dengê te helbest dipêje
mîna nanê germ û nerm
qet nebêje min ji ber çi!
dengê te kaniye yarê
te şiyar kir min
ji tirs û êşa xewninên roj nedî
te henasên dil çira kir
ta biqêrin bê fedî
ta bi destên xwe biparêzin
evîna sermedî

# Destaneke Mîdî

Di te de ez im
Jiyanek im di hundirê jiyanekê de
Damar û hest im
Di nav gewiriya te de
ez benek deng im
Bê mey mest im
Gêj in lêvên min
li ser erdnîgariya te
Xwîn û hêsir im
Ava şîn im
Evînek berz im
Di te de jîn im
Vîn û evîn im
Ezmanek e şîn im
Li nav zendên te de ez
har û dîn im
Hêviyek din im
Sosin û beybûn im
Di te de zindî me
Mîrnîşînekî mîdî me
Dîrok im
Kok im
rehjenên kaniyê me
Ma bê te ez kî me?
Bê te hestên min bi tenê ne
Bê xwedî ne
Bi te re
Ez destanek hemdemî me
Naveroka wê tev de evîn e

# Dîdara te

li dîdara te de rehjen
dike fîxan mîna her car

hemî xulek
bi hev re dikşînin êşan
bi te dîlber dirêxînim
buhara azadiya xwe

bi te ez radikim ezman
dema mîna çîvîk û çûk
dinav deştên kezî û mil
dilên ewran dilorînin

jiyana me hemî xewin e,
çiqas şahî bi te yarê
mîna kenê te yê xemgîn
gelek germ e

mîna lêvên te yên şîrîn
timî nerm e

delalê wer bixwîn e min
bi pênosa giyanê xwe
birînên min binivîse
şeva min bê te xemgîn e
li ser sînga gulên rizî
kenê xwe yarê birjîne

li ser te ez diweşim wek
pelên daran
di payîzê
bi maçên dînbûnê dimrim
mîna bazek bilind û girs
difiryam jorî memikên te
çiyayên xwe dişopînim
ji te nêzik û guh dûr im
xemên berfan
li ser te ez dibarînim

# Destana min

Dilber tu rengê hêvî
Cergê helbest û vînê
Bê te her tişt windaye
Tu rêya min şîrînê
Ligel te şadî dilmest e
gêjbûna min dibînê
Berkenê te giyan e
Dawiya vê axînê
Te bi hestê xwe ez şuştim
Bûm naqosa mizgînê
Kobanî û Dêrîkî tu
Rewş û xemla Efrînê
Ji te tê bihna sêva kesk
Bihna baxê Beybûnê
Barana îro ji min bû
Kovanên min dirjînê
Ta kengî ez ê dîl bim
Di girtîgeha ahînê
Êşên xwe ez dikşînim
Xwe dispêrim dûrbûnê
Bê te jiyan bê reng e
Yarê ey keça zînê
Xemgînî zor e her dem
Ew şahiyê dimrînê
Lê tîrêja kenê te
Hêviyan tim distînê
tu dîroka Mîtanî
bihna baxê Lêlûnê

şaristaniya gewre
qurm û şaxê zeytûnê
Hestê bê sînor  û gêj
Bask û bendan dişkînê
Jiyanî tu li ber cengan
Navenda vê hayînê
yekbar im mîna çiyan
Zindî me mîna xewinê
Hembêza te volkan e
Ey rengê hêsir û xwîn ê
tu warê şahiya min
ey  kujera axînê
çavên te roj û heyv in
ji min re name dişînê
hembêza te jiyan e
germahiya havînê
hembêza te gulxan e
şahiyan ew diçînê
erda kurdistanê ye
şoreşan derdixînê
kenê te ol e û doz e
dawiya zor û kînê
biskên te ronahî ne
lêvê te xemla şînê
Yarê riwê te war e
Êşa darê Mizgînê
Dahola cenga hatî
Rengê hêrsa êtûnê
hezkirina te eywan e
navenda hilm û bihnê

balindeyê di  ezmanê
wê  vîna me bixwînê
şeydabûna me tove
me avdabû bi xwînê
me bi dilsozî û xurtî
saz kir xewina nisrînê
geş kir giyana tazî
xweş kir warê Beybûnê
leyla yî tu û ez Qeys im
me saz kir ew dînbûnê
me ala vînê hilda
me ronî kir gerdûnê
têr nabin qet ji hevdû
bawermend in bi jînê
çendîn helbest pirbêj e
jîndar e li ser zemînê
kanî me li ber sînga te
dengê  te min digrînê
hêsirê te min dibrêje
barana dil dirjînê
helbesta min li ser te
destana mem û zînê
efsan e û her tê gotin
ta dawiya vê hebûnê

# Evîneke rastî

Evîna me
vedenga kaniyên rengîn
sirûd in, zindî ne
her dem
xwe dighînin  bilindiyê
dibin pêlek şîn û hêzdar
li dûr buxçe , gelî û zozan
dinivîsin birîna can
jibîr nakim kilê çavan
 dema hatin bi hêsirên te
li ser gulxane destê min
jibîr nakim çemên hingiv
 ji wan lêvên şîrîn û mest
tîrêja awirên kujer dema girtin henasên min
ne dudil bûm ligel te qet
bi gernasî li hember narvînê ez bûm
mîna findê zivistanê
di êvarek tijî serma
di nav peyvan de ez gêj im
bi dûrbûna te bê hêz im
were çêke kenê min ta
bibim şahiyek e rastî
li warê êş û bêzarî

# Ew rewan sax bike

Ez bi wêrekî ji te hez dikim
Bi te re kelemên jiyanê jibîr dikim
Bergên şahiyê
bi hembêzkirina te li xwe dikim
Ji baranê re ez sirûdên kenê te saz dikim
Peyvên min îro nerm in
piştî te lêvên min
bi nermbûna maçekê
şil kirin
Çavên min jî melûl in
Piştî te wan bi hejandina xwe
gêj û şaş kirin
Zincîrên tirsê jihevxîn e
Fermanan li ser dudiliyê rake
Dînîtiya xwe
ji zîndanê hişmendiyê derxîn e
Ew rewan saxke
Were xwe di nav min de bike Dicle û Ferat
Serdema payizê bitewîn e
Asîmanan li ser gewdeya min
dabeş bike
Perwînên sibehê ji bişkojên giyanê xwe
bifirîn e
Her xulekek e min dûrî te
xwebidawîkirin e
Her dûrbûnê bi xwe re tîne

# Gelê bê kiyan

Kurdên reben  bê war û Soz
Mîztin li ser ala pîroz
Qeşmertî bû ji wan re reweşt
Li  - Enqere - hildane poz
Bûn dijminê yekrêziyê
Nabe dîwar ew piştê xûz
Xwînmijê xwîna şehîdan
Nabin ti car rûmet û doz
Dizên jiyana me dibûn
welat kirin tenî û toz
*****
Rût in ji hest û bawerî
Parsê dikin li ber derî
Me tev birin windakirin
 kurmê xinizî  nemirî
Siyasta wanî kirêt
Ew afirand çanda kerî
Hêvî ji wan koça xwe kir
Gazî dikir sêdarkirî
ev rewşa gelê bê kiyan
mîna komê pezên gurî

# Gotûbêja dil

Jiyan ji dêmên riwê te distîne reng
bi dûrketina te ji min
her tişt li ber çavê min dibû ceng
dema tu li ber çavên min zindî dibî
her tişt derbas dibe bê deng
xewin di jiyanê de dijîn
dibin ji min re zanîn û hevseng
were ta em binyad bikin ew evîn
bibe ji bo min efsanek leheng
saz bike şahî
awaz û aheng
dilê min difire bi te
difûre bê te
mîna pelê darê zer li ser erdê şil
hêsiran dike kil
çîroka axînê dibêje
silav dike demborînê
jibîr dike çi birînê

# Ji bilî te

Kaniyên te min dişon
peyvên te çermên birînên min didrûn
di cengê de, tenê dengê te agirbest e
darên kesk kokên xwe ji memikên te ne
ta dirêjî rêyên di navbera min û te de
şaxên xwe dirêj dikin
ji baranê
hêsirên te tên li ser min
dilê min şil dikin
tîrêjin çavên te ji ezmana ku ez bin wê sekinî me
têne xwarê
çavên sirûştê kil dikin
sar e havîn bê hembêza te
cîhanên girs teng in bê tu hebî
ezmana fereh ne bi ferehiya sîng û berê te ye
ewra sipî laşê te ji jor ve diweşîne
nêrgizan ji canê rokê
li ser sirûştê dibarîn e
lehiyên girnijîna te
dengên avê
dişopîne
min bikuje bi lêvan
bihêre min bi maçan
evîna min pirtûkek e lê nayê xwendin
tê hembêz kirin
di nav zendên te tê danîn
bi hêsirên te bergê wê tê xemilandin
bi bihina sînga te tê dagirtin

Efrîniya awiran
barana îro hinek ji destanên hêsirên te ne
tariya ewr ji dîmenên keserên te ne
were min nehêle ji demê
dem mirin e
kat dojeh e
felek dûpişk e
tu tenê bi evînê bawerî
dijî xemgîniyan baş ragirî
tu agirî
ji vî dilî
hez dikim li ser bilindiyê memikên te de
bifirim
guran serjê bikim
efsanan saz bikim
ronahiyê xwedî bikim
memikên te yên berfîn
paytexta mem û zînan in

hez dikim li jor wan bifirim
dojehan bi ser dagirkeran
ji bilindiyên wan
bibarîn im

di nav hevrîşmên laşê te de nimêja evînê dikim
dîrokek e nû ji evîndaran re çêdikim
Zîna min e di zîndanê de tu yî
di çavên te de hezar zîndanek e mîna Amedê dişewitin
hezar milhûr di tariya porê te de difetisin.

# Maçên har

Mîna ramûsanên te
Peyvên min har û dîn in

dema gazî dikin te
bend û baskan nabînin

çavên te heyv û rok in
mîna min mest in, gêj in

xwe dispêrin bejina te
kovanên min dibrêjin

Sêvîna dilzîz û nerm
ez tîme li ber te her dem

herdû sêvên çiyayî
di nav wan de ez dihelim

çendîn dilşad û gêj im
dema lêvan dimijim

maçên me şoreş in em
azadiyê dipêjin

dema destên te digrim
erd û ezman dimeşin

dema memik dimêtim
zozan û gir hev digrin

stêrkên havînê dimrin
hêsirên heyvê dibarin

çongên te herdû şax in
mîna  dicl e û ferat in

min deyne li ser sîngê xwe
çendîn maçên te har in

# Mêyatiya Arî

De wer tevde volkanê
 bi maçên  xwe lê canê

memikên te ji bo lêvan
 dagirtî ne giyanê

te ewqas xwe tirsandî
 çima bêje ciwanê

dildarî ola me ye
 ew rastiya  jiyanê

min deyne li ser nafkê xwe
 caran min rêke nivî

ta mestbûna min bigre
 damarên hestên birçî

min deyne li ser wan sêvan
ta av bidin lêvên tî

ta  ji bo te ez ava kim
 burca viyana zindî
tazî be mîna heyvê
dema xwe dighîne xwarê

wê berbendê dûrxîne
 rake li ser wan vê barê

agir be ne dudil be
lê pepûkê ey sarê

laşê te di nav tariyê
xwe dikşîne wek marê

nehêle min tu carî
çendîn zor e tenahî

dema zendê min dighe
ew zendê germ û sipî

hemû destanan digrîn
li ber mêyatiya Arî

# Meyxaneya lêvan

Meyxana lêvên şîrîn
Ew buxçeyên sîng û ber
Ji laş û dil re gor in
Ew sêvên nûgîhayî
ew porê reş berdayî
mizgîniyan dispêrin
Tu yara hestên bêdeng
Tovên beybûnên heftreng
Jiyana nû destpêbû
Dema tu hatî ba min
Gulya te şewqa rojê
Ji nav tariyê derxist
ew ronî kir ezmanê
Ta şad bike jiyanê
tu ji min re bûye ew find
ronî dike cîhanê
nûjen dike dildarî
berhev dike zarzarî
gerden şad e padîşah e
li ser sînga te yara min
dema ew gerden tê xwarê
min dikşîne nêzî te
mîna pêlên deryayan
çendîn dîn e mîna min

# Keça kanî

Evînî  tu  gulistanî
Çelengî tu bêrîvanî

Ji Adarê re nîsanî
Ji erdê re tu ezmanî

Şîrîn lêvê sipî sîngê
Ji  min re  tu dil û canî

Ji payîzê re Avdarî
Ji havîn re zivistanî

Ligel te ew keser xweş e
Ji giyan re tu dermanî

Li gel te xemgînî geş e
nema dijî perîşanî

Xwezî di hembêza te bijîm
Bi aramî bi hêsanî

Xwezî zendê te yên nermûk
Di nav min de bibin kanî

# Nû viyanî

Nû viyanî nû giyanî şahiya hestê min î

Havînî tu payîzî tu rengê nîsana min î

Dil te heland xanima dil tu evîna min timî

Rake xemgînî ji ser min raka baskên hesinî

Memikên te kaniyên çiyayê jorîn û bin î

Kobaniya min tu heyvî rok û ewra mezin î

Tu ji kevinê dem û dewran zindî yî her vejîn î

Nû jiyanî nû rewanî Kujera êşa min î

Min bilind ke li ser xwe yarê rêxe xemla sosinî

Min nema biyan bihêle min bibe ji warê tenî

tu welatî bingeha şahî tu yar û hevjîn î

tu Ferat î Dicle yî tu rengê ezmana şînî

gerdûna bê cengî tu hingiv ji lêv dirjînî

gewdeha te cîgeha xewin û nîgaşên rûkenî

wê evîna me vejîn be, wê bimîne herdemî

Kobanî bi wê serbilind be ew viyana serdemî

tu dizanî ew kenê min ji zîndanê dil rêxînî

tu tenê şahiya rastî di hundirê min diçinî

avî , hestî tu henasî , cerg û damar û xwînî

şahiya min bê sînor e ligel te tu mîna min î?

ez dizanim tu mîna min har û mestî tu dînî

ez ji te hez dikim netirse ji topê narvînê ji binî

wê dîroka dildariyê bê nivîsandin hemî

wê  azarî bar bike ,ger tu memikan derxînî

tu xwedawenda min î tu dawiya vî xemgînî

# Ola dildariyê

memikên  te du heyv in min
dane li ber  kaniyên şîr

min mest kirin , winda kirin
serxweş kirin hizr û bîr

te jiyana min dagir kir
ey dermanê hizr û bîr

li ser sîngê te  mîra min
ez bûm padîşah û mîr

hêsirên min li ber leylana te
bûn qurşîn û geh bûn tîr

tevlîhevbûn helbestên min
te gêj kir ew hişê jîr

**
dildarî hişê min bir
min xist e li ber bayê sir

çavên te yên nîv razayî
dudiliya min jêbir

hembêza te warek nû ye
di nav de êş û kul dimir

****
Memikên te   bi rûjî ne
bê lêvê min jinbî ne

pepûk in  dûrî lêvan
bê destên min sêwî ne

herdû sêvên çiyayî
bin cilan  veşartî ne

mîna gellên bê dewlet
her çax û dem birçî ne

ew memikên bawermend
mîna dil dîlgirtî ne

dikşînin  êşên salan
li ber lêvên min her tî ye

heznakin bask û bendan
memikên te Mîdî ne

mîna zozanan şîn in
mîna çiyan zîndî ne

hingiv in çedîn xweş in
mîna berfan sipî ne
***

ey yarê nêzik be  ez
bê te bê reng û hest im

derxîne memikên xwe
ez bê wan dîn û mest im

ax ji çêja lêvên te
çendîn bi wan serxweş im
*******

efrîniya min bê te
ew evîn bê giyan e

ew evîn  hindek toz e
çîrok e û geh efsan e

dîdariya te min kuşt
dûrbûna te volkan e

dildarî olek girs e
li  ber wî ew ol ferman e

# Partîtî

Hevdû napejirînin
hevdû dişemitînin
zimanên wan dirêj in
pirbêj û gotarbêj in
lê di warê jiyanê de
zibilgeh û qirêj in
parastvanên durûtî
evîndarên parçîtî
hêvî ji wan çendîn dûr e
yekîtiya wan zor e
çanda partîtiya me
koratiyek dijwar e
talîzokek e girs e
nakokî têde kar e
hişê Kurdî bindest e
kî wê rake bindestî
rewşek bêzar e û têde
her tişt bûye partîtî

# Pêljîn û Pêlvîn

Bi xêr û xweşî hatin
roj û heyvên ezmanê
hûn tîrêj in , sorgul in
avahiyên viyanê
Pêljîn û Pêlvîna min
ey çûkên Kurdistanê
navnîşanên ronahî ne
hûn nirxê her pîvanê
darên zer çendîn geş bûn
ji ber awazên giyanê
bîst û çarê Êlûnê
hûn hatin vê jiyanê
payîz bergek nû li xwe kir
şahî da asîmanê
xemgînî çû bi rêya we
mîna êş û kovanê
bi hêvî me di vê rojbûnê
koç kin êş û qeyranê
rojbûn we destpêk be
ji azadiya ramanê
ta jîndar bijîn aram
li her aliyên cîhanê

# Arî ye

Giyana a li ser erdê dimeşe
Stêrka a ku şipiya li pêş gulan disekine
Şewqa xwe dide darê tirî
Dengê xwe dide daholên rehjenê
Çendîn mîna jiyanê kûr e
Mîna evînê kor e
Xwedawendek Kobanî ye
Hebûnek e sermedî ye
Lêvê wê kaniyek bê sînor e
Bejina wê sihek mor e
laşê wê ji min re çiya ye
Di nav min de baran û ba ye
Sinc e ji şahiyê re
serbir e ji xemê re
Payizek dilşad e
Zivistanek padîşah e
Buharek bê dawiye
Havînek jinbiye
dema diaxive
Genimên welatan ji zendê wê difûrin
Çîrokên reyhanan ji xemên wê diweşin
Lehiyên mey ji nêfkê wê dimeşin
dema radibe
Hemî gerestêrk pê re radibin
Rû xwe di berbangê de dişon
Nimêjên dirêj ji erdê re dikin
Çendîn peyv li ber wê

tayê demsalan dikşînin
Beybûnên buxçeyan xwe ji kuxikê dikujin
qêrînên tund derdixînin
dema dikenê
Hingiv ji giraniyê xwe diweste
Ji şîrîniya xwe re malek maç ava dike
Li ser dîwarê malê
lêvê wê saz dike.
Li ber wê peyv pez in
Bêdengî gir in
Bejina wê
li jor kobanî alek hildaye
Sozek maye
Evînek nû û germ e
Birînek xweş û nerm e
Çira dike sêwir
Bilind dike agir
Cîhan sar e
bê hembêza wê
Agir ji qeşayê sartir e
Eyaz bayek sir e
Li ber wê kevok xwe rût dikin
ta bijangên wê ji xwe re bikin berg
Li ber wê sirûşt mest e
Kanî vedireşe
Kendal gêj dibe
Sîber xewinên xwe dispêre rêyan
Destên xwe dirêj dike çiyan
Jinek kevinar e
Ji şehnaziyê re rim û al e

Ji henasê re tembûr e
Ji dil re bar e
Ji sêwîbûnê re dergûş e
Ji geşbiniyê re war e
Stranek Horî ye
Govendek bê serî ye
Ji ceng re aştî ye
Xwîneke rêzkirî ye
Hembêzek e birçiye
Nalînek e tiye
Ariye
Kurdistanî ye.

# Qêrîneke Gêj

Dil ji bo te mîna ewrê payîzê
berve roçûna belngaz her diçe
xemgîniyên bê sînor tim distre
kom dike hêsirên xunavê
radike bihna gulavê

dil diqêre wek bilûrê
serdema kul û birînê ew dijî
radike kovana salên ronedî
kes ji te pêve nîne yar
ku hêja be ew evîn
ejî mîna te dinalim
giyanê min hate sotin
dûrbûna te agirek sor e û gur e
mîna reşmarek bi qoç
jehrê xwe difrûşe min.

ezê bêjim evîna xwe
bihejînim di her êvarê şewqa te
biweşînim çîrokên xwe
bûn e rêwî
jibîrbûyî

mîna xulekek e bêhiş
jiyan bi lez derbas dibe
evîna te tenê êş e
tenê qêrînek e gêj e
mîna darên rût û birçî

ezê berdim xwîna hêsiran
li ser rêyên girêdayî bi nalînê
bi diljarî hemî peyvên min in sêwî
dixapînin giyanên tî
ku derxînin ji bîranînê  baranê
di min de agirê te yarê vemrînin.

# Rêyên xwar

Ew memik çendîn har in
herdû lêvan min xwar in
ez bê wan mest û gêj im
peyvên helbestê sar in
lê peyvên min ji bo te
tîrêj û pêt û ar in
mije jiyan dûrî te
hemî rêyên min xwar in
jiyan nîne bê te lê
keça hayîn û jînê
ligel te jiyan efsan e
şîlanê lê beybûnê
ez naxwazim ew kêlî
naxwazim hest û xwînê
ger tu nebî ew jiyan
warê qeyran û kînê

# Rojiya merd

Dema heyv heyvekevan dibe
mêjî bi deziyên gêjbûnê
bi hevdigere
zik tî û birçî dibe
bihna mirinê
ji devên rojîgirtiyan derdikeve
laşên sist bi dirêjî rojê ve
dernexûn dibin
li welatê nivişt û efsanan
li warê gendel û derewkaran
durûtî têde xwedawend e
serxweş têde dadmend e
çi dike gelo ev Remezan
bi hiş ?!!
henas di temara giran de
bê ageh dihêle
li welatê min de
welatê gulên civilî
rojhilata navîn
xwe ji her şaristaniyê rût dike
cil û bergê çolê li xwe dike
çi rojî bi serê pûç dike?!
Li welatê ku ax devê xwe
ji xort û zarokên xwe re vedike
bajarê ku di paşîvê de
çavên xwe ji mirinê re beloq dikir
şevê ku laş bê serî dikir
welatê ku têde slogan serkeftinê saz dike

bi gazî û nimêjê binkeftiyan kedî dike
dema heyv nûheyv dibe
hişê xelkê bi derbekê dibe
rojhilat xwe bi tozê Erebistanê ve dixemilîne
nezanî bi xweşecanî
tevinê rewrewkan dirêsîne
gendel dibin şoreşger
zordar dibin pêxember
li welatê min e bê ser û ber
mêjî têde mîna zik birçiye
dil ji evînê bi rojiye
hêvî toz û teniye
mirov di nav de mîna maf bê xwediye.

# Serxwebûn

Ta ku bijîn em û hûn
pêdiviye serxwebûn
jiyanek bê azadî
wateya wê tunebûn
em nifşek nû dixwazin
bawer e bi maf û hebûn
rexnegir e û dilêr e
bawer nabe bi sofîbûn
rêbaza xwe xwendin e
ji bo wî jiyan e zagon
vîna xwe kurdistan e
kar dike ji bona nûbûn
bi hevdû re em bi hêz in
maf e ji bo me dewletbûn
em ne Sûrî ne û Tirk in
û ne jî Îranî ne em
nabin Îraqî jî qet
lê Kurd in her çax û dem
Kurdistanîno rabin
bişkînin ew bask û bend
yekbûna we wê çêke
avahiyên hiş û pend

# Tu namirî

Tu namirî , mîna xwedê
tu zindiyî di vê dinê
tu mezinî bilindî tu
mîna çiyayê Hemrînê
tu vejînî evîna min
bedewbûna vê hayînê
tu ew evîna bê sînor
di nava êş û nalînê
tu xanima birîna sor
henas û hestê gerdûnê
di nava sînga te ez im
welatek im ji ahînê
bi maçekê ji lêvê te
ketim dîroka beybûnê
jina çiyê , were ji bo min
min dûr bixe, ji dûrbûnê
de zo were nêzik bibe
xwe rût bike ji axînê
de geş bike êvara min
bi hatinê, bi mestbûnê

# Were

Ez tême ji bo çavên te
lêv şîrînê, dilzîzê
ta vemrînim pêtên te
ji te bigrim cerg û hêzê
hembêza te min sotand
hember bayê bahozê
jiyan nîne dûrî te
nazdarê ey dilsozê
dîdara te wê rake
xemgîniyên payîzê
wê awazên ronahî
ronî kin dêmên werzê
ji bo min tu roj û heyvî
ey viyana newrozê
ji bo min tu xweş awazî
ritma rêbaz û dozê

# Wendabûn

Wêneyan  hew rabikin
 û bi dîwaran qet nexin
ew peykerê zordarî
li erdê de hûr bikin
piştî xwîna sor rijî
hêsir jî bûn e  lehî
tiştek ji hişê pêve
 rûmetê naparêze
nebe mîna  pezê kor
 mîna kerê di binê bar
gumanî xweş şêwaz e
ji sofîtiya bêzar
ew serok nekin xwedan
 ew mirov nekin qurban
her kes wê derbas bibe
wê  bimîne niştîman
serkeftinên me vir in
alên  me çendîn pir in
bi sloganên xapînok
destkeftiyan têkbirin
ka ew hişê siyasî
ew rêbaza zanistî
me ji windabûnê dûrxe
ta ku bijîn bi xurtî

# Çendîn zor e tu Kurd bî

Kurdistanek ji kaxez
ji rewrewkan rêsandin
jîna me bû hevgarî
dema gotin rizgarî
me bi hêviyan pêçandin
çendîn dijawer e ew benc
pê hizrên me razandin
zor e çendîn tu Kurd bî
bê ling û dest û ser bî
pir al bî û pir partî bî
tu nîgaş û hem vir bî
lawên Donkîşot in em
Ji nîgaşan têr nabin
Tilîliyan li her der
Mîna Baran dibarin
bi gotarek şoreşger
azadî afirandin
Sofîkên diljar û mest
Ji zo ve razayîn e
Bi razanê zindî ne.
Komek bi hev re meşîn
99 neh beyreq hildan
Gotin em serkeftî ne
Gotin em azad bûn e
ji hişên xwe azad in
ev war ne erd e û neqş e
serwer ew Kurdistan e

ger ew saxbe em sax in
Kî hişmendiyê girtî
şewqa ronahî dizî
me di paş dîrok de hîştî
Çendîn radestbûn xweş e
Li ber Jiyana me bi rastî.
Cîgîr bû ew windabûn
Yekgirtî ma parçîtî
Bû têkçûn rêbazek kûr
Ket hizrên pûç û rizî
Kurdistan ma mîna xewin
Ji bermayê çerxên xwînî

# Pêla demê

**

Kenê te awaza xewinên nûgîhayî
Ew diweşîn e ronahiyên viyanê
Min tenê kenê te dikşîne
ji nişkêve şîrînê
Mîna pêlên agirî ne
Sînga te min dikşîne
Dema laşên me bi hev re distrin
Herdû laşên agirî yegirtî ne
Herdû lêvên me leheng û serwer in
Em bi hev re serdemek nû saz dikin
Navnîşana serdemê dildarî ye.
Naveroka dildarî azadî ye
Bê xem û
Şerm û fedî
Ev evîn rengek nû ye.

**

Tu pêla xewinên zindî
An xewinek bêdengî
An awazek bê dawî yî
Havîn bê te bêzar e
Bi sermayê navdar e
Pêla te min dorpêç kir
Sînga te warek nû ye
Têde jîndar aram in
Ez warek nû dixwazim
Dûrî ceng û bêzarî
Dûrî êş û her tiştî

Herku li te ez dinêrim
Hestek geşbîn min digre
Ew dimrîne êşên min
Ew êş peyv û roman in
Destanên  dil  efsan in.
Ji roj re ew sihwan in
Ji heyv re erd û ban in.
Çavên te destrînin
Peyvên min ew dirjînin
Mîna kaniyên jorîn
Xewinên avî  datînin.
Porê te êvar e û ez
di bin porê te dimeşim
Guliyên wê ji hêsirên heyvê
Reştariyên jiyanê têde dimrin.
Li pêş karwanên helbestan
Berxên rehjen diçêrin
Maçên ewran distînin
wêne ji xweşî re digrin.

# Silav Kurdistan

Ji welêt re
Bermayên hesretê
Ji jinê re
Temenek bê veger
Ji bedewbûnan teva re
Helbestên bê nav
Û hestên germ û xav
Ji beybûnê çiyayî re
Ji êşên jinbî re
Ji silavên tî re
Bîranînên min
Hêsirên peyvên min
Dema serên xwe mîna serhildêran bilind
 hildidin
Dema peyv hevdû ji nêza dixun.
Û çivîkên hêviyê çermên çêlîkên xwe digezin
Dema nimêj ji xwedê direvin.
Dema ceng bi aştiyê re diraz in
Hemî tişt puşt dibin.
Feleka Kurdî rewrewkan
Ji paş piştê xwe ve derdixîne
Şaristaniya binkeftinê ava dike
Hêsir jî dibin qetran.
Newrozên bê agir dişewitîne
Û riwê agirê hêrsdar disojîne.
Dema evîn dibe gor
Zivistan di bin germa havînê de dilerize.

Birîn xwe li hola evînê sêdar dike .
Her tişt dibe wek hev
Mirin û jiyan pêxwas
li paş karwanên darbestan dimeşin
Buha û erzan
hevdû di bazarê valahiyê de difroşin
Derd û derman
Mirovên saxlem
Seqet dikin
Û yên nexweş
Wana bi cil û bergê nojdar ve dixemilînin
Li pêş çavên dilê min de
Dengê tilîlî
wek nalînekê ji dûr ve tê
Dengê wê
Vedenga dahol û zirnê ye
Peyamên Kundan dixwîn e
Ew yonan bû
Û niha dewlet e
Ew Roma bû
Û niha Îtaliya ye.
Lawên Iskenderê mezin jî
Dewleta xwe ava kirin.
Farisa kevin niha Îran e
Û Osmaniyên berê
Lawên xwe li vir in
Li ser laşên erdê kona xwe ya girs cîgir kirin.
Em tenê erd ji me nefret dibe
Em ji welêt derdikevin
Bi şehnaziya kujerên xwe serbilind dibin

Û karwan du karwan
xwe li deryan diqelibînin
Û berdewam dibêjin
Silav Kurdistan
Silav ey netew
Silav ey Xewina bedew.

# Tenê gerdenek im

Ez û tu du hestên sotî ne
li warê pîzotê sema dikin
Û destên min û te du balinde ne
hevdû di nav ewrên şermok de
hembêz dikin
Çendîn girêk hebin
Lê bi hevdîtinekê naye jibîrkirin
Tên e jinavbirin
Werîsa evîna me ji baranê ye
Ji kaniyên Kurdistanê ne
Naye birrîn
di xew de te dibînim
eywanek Mîdî
Evînek hemdemî
Te çîrokek ji destanên pêşiyan dibînim
Ji bermayên evîndarên xuristî
Ez ji bo te hemdemî me
Dîrokek zindî me
Zayînek im
Ahengek im
Cihê min di newalên xewina te de ye
Periya min
Li wir xemgînî sêdarkirî ye
Ahîn jî vemirî ye
Tu her li ber min zarokekî
Û ez di nav memikên te de
tenê gerdenek im.

# Nepeniye gerdûna me

Xweşkokî tu
mîna jiyaneke di min de bicî dibe
û awazekê ji dûr ve
bi pistepista te re tê
maç bi ser min ve bibarîne
êşa min ji ber peyvên te tê xwarê
tevtevîk ji ber dengê te gêj dibe
dema rehjena min li jortir ezmanê radike.
çavên te matmayîne
di nîvê zerbûna cîhanê de
a bi mij re ligel deryayê
melevaniyê dike
li ser sehneya şanoyeke sihtarî
dengê min rehjena dilê min
mîna zengilekî lêdide
ta bi vedenga pistepista te re lêkeve
bîçimên te ez pencemor dikim
bi pencemora siha xwe yê winda re
li endezyarbûna xweziya xwe ez dinêrim
dema bi qasî wê hêvî dikim
bibim dilopek xûnav
di nav herdû lêvên te de daliqandî
çendîn nepeniye gerdûna me
razayî ye
li nîvê rêya a me ji hevdû ve vediqetîne
min vegerîne reşçavên xwe
welat ji derveyî çavên te ve penaberî ne
bila ez mîna rehniyekê

di nav tariya nikdara herdû memikên te de
derbas bibim
û bila piştî hembêzkirina me ji hevdû re
lehî were
lêvên te dilê min li ser terafê dibrêjin
nîşanên riwê te
li bilindî axîna min melevaniyê dikin
mîna masiyên biçûk
li deryaya bêdengiya min e kûr de dabeş dibin
di damarên te de
êşa min digere
bi êşa te ve diterpile
herdû mîna camekê li ser navenda rê dikevin
herdû milên te
meydana birûskên hêçbûnê ne
li ser herdûkan serbirxane ne
bêhêviya min serjê dikin
min li ser erdîngariya xwe ya azad
mîna refên sîperan
biweşîne
berfan ji devê lerza xwe yê dawî ve vêxîne
ey şahjînê.

# Çiya li siwara xwe digere

Li pêş şehîdbûnê
Bejinên çiyayan kurt dibin
sitranên xemgîn
werîsên xwe yên qayim li dor hêsiran digerînin
berfên zivistanên Kurdistanê
bi xwîna zagrosên xwe difetisin
bi êş
bi nalîn
di golên xwîna cangoriyan de digevizin
hêsiran jî hemî rêbendên çavan derbas kirin
li pêş karwanên nemiriyê
hemî wêjeyên cîhanî xwe ditewînin
ew hestên tev bi keser hewil didin
tiştekî ji ferhenga pakrewaniyê têbighin
ev Helbest li hêlîna xwe nema dikare vegere
Piştî girtina çavên te
ronahî li welêt nema dixwaze piştî tariyê derkeve
lê dibe agir li newrozan gur dibe
li ezmanên me rengên aleke bê xwedî distîne
Tu ew denga ku ji kûrahiyên serdemên buhirtî ve
ji nû ve tê bi bez
vedenga xwe her dirêj û bi hêz dike
ta bighêje siberojeke nediyar
tu ew denga a bûye
zikmaka çi qêrînekê
çi fîxaneke hewil dide
nîçira binkeftiyan bike

Kurdistan bi arezûyê ve dorpêçkirî ye
Ew rêyên dirêj û asê
Li şopên lingên te digerin
te li her deverekê hêviyekê çandibû
kelheke evînî avakiribû
ta nifşên nêrgiz û şilêran
bibin ciwantirîn şagirt ji rokê re
taku heyv serê xwe li ser çiyayan bi şadî
bi aramî deyne
eger ezman di reşşevekê de hat e reşepêşkirin
dewsa çi stêrkeke rijî te hezarên stêrkan bicî kiribûn
ta bibin ji xewinên Mîdî re nobedarên dilsoz
û geş bikin di temarekê de her rê û doz
niha jî hemî stêrk
Hêsirên xwe yên şerpîn dibarînin.
Li dor darbestên te dibûn dû rêz
bi merşê- Ey reqîb - lingên xwe dibin û tînin
De bila peyv ker û lal bibin
peyvên pepûk li ser zimanan tên e sêdarkirin
Tiştek li hember şewata barkirina te taltir nîne.
Li pêş barkirina te xemgînî bê wate dibe
tu ji hemî şêweyên girî û ahînê watedartirî
ji gotinên şîniyan bandortirî

Kobanî û hemî deverên ên tu lê penage bûy e
vê yekê dizanin
kavilên wêranbûyî bihinên rewrewkên te kom dikin
ji bermayên siha te keleha mezinahiyê ava dikin
Berfên Kurdistanê îro
bi sorbûna xwîna te xemilî ne

Siwara Cudî
Sosina agirî
Sêwî ne efsanên me
tenê ew qurşîn destanên diyar
 li goristanên nejibîrkirinê dineqişînin
û helbestên me
 li pêş dîlanên wê dicivilin û dimrin
ma destan çi ne?!
Li ber lehengiyên cangoriyan
Hemî toz in li ber bejina te
 ey binefşa azadiyê
Keça serxwebûnê.

# Bi hêvî me

Bi hêvî me her vîn xweş be
bi hêvî me jiyan geş be
çima gengazî û niyazî
li cîhanê her tên kuştin
dîl e ew hêvî
dîl e ew şahdî
li jiyana me
tev bûn e şînî
evîn û ahîn û nalîn
dilorînên hestên peyvan
diafirînîn helbestan
di cîhana evîndaran

# Ez te hildipêçînim

Ez bi hemî rengên te
guncivêl û sedefên te
te hildipêçînim
li dor te ez hişkiya komserhevbûyî
huskirin didim
nediyarbûna danhiştî serjê dikim
hurgiliyên te di kezeba boşbûnê de binecîbûye
destê xwe li ser tenekeyên pûngê
nêzîk pencereya min danîbû.
Tovên qerenfîlê kom dikir
Ta li jor ewrên min biçîne
Ew di min de artêşên xemên min belawela dikir.
Evîna te ez bilêv dikim
Dengê min li ser dengê mirina belavbûyî dikeve
Mîna darên zer li kolana baranê
Û vedenga min diaxive
Ji bilindiya xemgîniya te
riwên xwe yên lawaz distîne
Vedenga giyanê te yê çermok vedigerîne
Heyranokên ewra dirêj distîne
Ji bo hêsirên te desmalan dikşîne
ji derveyê pirsên sîberê
Dûr min te derbiderkir
Min di te de gêncî û bayê zarkotiyê vekoland
Ji bo tu tevî şewba tirsê şad bibî
Û rolên lehengiyê werbigrî
Ji bo evîn nemîn e gotin
Li ser serbirxaneya binkeftinê bimre.

Min bi benên birûskên çarîndirêj girtibû
Taku bibin serma û aştî
Ji giyanekê re di nav de tovên dildariyê şîn bibûn.
Ta bihna xwe vekin mîna xweziyekê
Li dergûşa zarokekî bi aramiyê ve
 kelejin dibe xwe bicî kiribû.
Ji beyarên bêhêviyê re lehiyan dişîne.

# Ronî be

Di te de rengê tariyê bi min re dikeve berpoziyê
Min dihêle ez mîna ewr goşegîr bibim
Di hilavêta te de, di hestê de te ez dijîm
Rehnîbûyî, ronîbûyî di zikê şevreşiyê de
Siha min di nav mij de nehêle
Xulekek e dûrketin bi qasî salekê ye
Ez di hêsir  û xwîna te de me
Di damarê te yê evîndar de me
Ji te hezdikim ey germa roka rojê
Di giyanê min de tîrêj bide ji ber tu evînî
Tu ew şewqa a ku tariya min
 bi aramî bi min re parve dike
Wekî tu ew domahî bî
Du hindirê wî de sirûd
di nav qelebelixiyê de berz dibe
Wekî tu ew rizgarî bî
A di hundirê wê de nexweşî xwe dide alîkî
De xwe bi kûrbûn di dilê min de berde û bistre
Di nav xwe de û bila ew tevderbasbûn destpê bibe
Em vê jiyanê dirêj hembêz dikin
Dibin herdû mîna du agir di nav gurbûnê de

# Ferkera evînê

Tu ew awaza a ez di nav qêrînên xwe de lê digerim
Axa a repkirî mîna alekî şerê mij û moranê dike
Bi te re temen digindire mîna goka berfê ji bilindiya felekê
Bi te re şadî dibe sîperekî
bi neperûşkên xwe ve xemgîniyê digre
Û ji bilindiyê ve çedike ji bo me
Were û şana bendewariya xwe
li ser hingiva hesretên min de birjîne
Xwe bi min tev derbas bike
Kanîn zendên te li ser zendên min deyne
Kanîn lêvên te bi ser lêvên min de
Kanîn memikên te ji ser wan hîzara çepandina rizî rabike.
Maçên xwe dirêj bike
Ji ber ew ferkera evînê ye ji evîna me yê girs re
Ew evîn tirsoka min destika şûr e a ku piştê felekê dike du qet
Zanibe wî raje ji ber jiyan holek e fereh e
Û ceng dirêj e
Û rê li nemiriyê di navbera sistbûn û xweziyê de derbas nabe
Ji bazadana ji sepiyên dilsoziyê şiyar bibe
Zerbûnê ji riwê ezmên ve jêbibe
Pêvajoka marên çençenî rawestîne
Were ez te ji vê bizorkirinê
Û ji hingemeya tariyê rizgar bikim
Were em van êşan reşkûj bikin
Bese jevbûn
Ev dema tolhildanê ye
Nemre ji bilî tek carî
Şerma mezin e ku em her roj, meh û salekî bimrin!

# Axaftinekê li ser kenara dînbûnê

Dilê min xwezî dike
Ku di çavên te de mîna roniyekê belav bibe
Rehjena xwe li jorî te mîna stêrkan belawela dike
Ma ji xwezî re ji bilî ku di tariya xwestekê de bicî bibe heye?!!
Jêre tenê şelteya sêwîbûnê ye
Xwe pê bi derbasbûna demsalan ve dipêçîne
Min ji gulekê derîne
Min ji xemên min rût bike
Mîna dema tu xwe ji çi cilî ve rût dikî
çaxa xweşuştinê
Ez ji bilî te tenê qêrînek im
Fêrî vedenga xwe bûye
Ji bo pê zikên vedengê qul bike
Rehjena min xwezî dike
ku te mîna çekekî di riwê sêwîbûnê de hilde
Taku di hembêza te de
xwe ji eyarê eyara te ve veqetîne.
Bi goştê te digre
Bi temara te re lihevhatî dibe
Ta nefesa a dibe henasekêşanekî
li ser şanoya henaseberdanê.
Li ser lêva min şînbûna ezmên
Bûkmezave
Hilmên beybûnan
maç bike
ji malzaroka memikên xwe ve ji min re
cêwiyên zîziyê derxîne

taku ez bi aramiyê hest bibim
mîna xezalan bazbide
paş koçkên jibîrkirinê ji qurzîkirinê şiyar bibe
bila bîranîn piştî me yara min bimrin
bila xemgîniyan diyar bibin
piştî evîna te bila lehî destpê bibe

# Dema kovan diaxive

Dêmê te yê westiyayî ez tînim bîra xwe
Hespên maçên rawestiyayî nêzik memikên min in bilind dixirxirînin
Li benda atêşekî ji kovaniyê ne
Ji dergeha lêvên ezmanî ve
Çi evîn najî eger me nêdarbûyî venegerîne.
Daristanan em tînin
Tirî û darqeseb em bi pel digrin.
Daristanan ji pêvemanên me ve
cengan ji hevpijiqandina me ve
Û nemiriyê ji evîna me ve
em kurtas dikin.
Mêraniya te ranaze lê dimîne rawestiyayî
Mîna avahiyên dilsoziyê beranberî burcên jibîrkirinê.
Ranazin lê nûbedariya min dikin
Min fêtkar dikin
Û bi zêra zalal a ji roka ku derdikeve ji pişta min e rûtkirî beranberî te dipişivînin
Bê hilma te
Gul nêzik penceraya min sêwî dijîn
Pora min dikene
Dema tu bi rehjena pêçiyên xwe yên lezgîn hembêz dikî
Wekî ku rehjeneke berşîr be
An makekî be
serê xwe li malzarok dixîne
Rojên min bê te serserî ne
Min ji kazîna pepûkiyê biçûkê min dûrbixîne.
Min gîha û ewr birêxîne

Li ser wê
Keraviyên sipî serav dibin
Ji min mîna ewran derbikeve
Ewrên ên nûçeyên rehniyê dibêjin
Ev hebûn maskekî reş e
Ji derveyî wê mirin devê xwe ji henaseberdana min re vedike
Min dagirtî hembêzkirin bike
Her tişt li dora min zarîn e
Li dor qirika min neynûkên barkirinê lihevalîn dibin
Wekî ku ez di te de dewsa stêrk cîgir bibim
Di berhevkirina odeya razana gerdûnê.

# Domana şewatên serdeman

Memikên xwe yên genimî damalîne
Pêşiya lêvên min
Ta genim li ser sînga min şîn bibin
Û bihna te jê biforin
Ta bi başiya daketina baranê ji ûtobîsa ewra lezgîn ve dagirtî be.
Maçeke berfireh mîna kurtika bê bide min
Pişt re ji nişkêve noşek Wîskî bide min ji kargehên meya a ku ji qirika te dirje dema derbaskirina a bi zîzbûnê ve dagirtî
Li ser min qehweyeke reş birje
Serên reşmarên xemsariya min e çençenî qut bike
Ta pîrozbûna ezmên li ser me dakevin
Baranekî dihêle rehnî  derbikeve ji du sermemikên şilbûyî bi gilêzekî dêwlax ve.
Haj lerzên me yên şayik nîne
Û ne ji hevokên ez ji te hezdikim û ey dilo min gelek çirûsîn û mest bike.
Min bi darê zimanê xwe siza bike
Dema wekî zarokekî nehis şerê xwe bi zimanê min dide .
Tirsa xwe lêhilhat bike dema kesekî derbasî li ser me dibe çipbûyî.
Wekî ku ezmûnek hebe û bi çillekî çavdêriyê dike
Devê min e razayî li gora devê te hez dike girtinheviya Reqîb û Etîd bibîne.
Hez dike bibîne Ezraîl dema dikeve korta mirinê
Taku Israfîl pîbika xwe di devî wî de pif bike
Û wî bi hêza xwedayekî bibe
Te bi hêsirên te şuştin

Bi merdiya sertiya xwe te kefen kirin
Te wan jibîrnekir.
Pişt re ez mîna wêrekiya çekdarekî rabûm ji bo te bergiriya li te bikim û darên wan li ser te vegerînim
Lê azariya wan li hember te bi te xweş dihat
Te darên wan ji destê wana biribû
Û li ser pişta dilê min te ew dar neqişand
Ta ez bûm e şehîda te yê nediyar
Were ey nehêneya peyvên min
Ji xemgîniyên min çi tu dixwazî ji gêncîneyên êşê talan bike
Kederên min bidize
Şopên xwe li ser rê bihêle
Hilmên xwe li paş xwe bihêle
Di min de bila domana şewatên serdeman vekolînin.

# Dîlanên dema buhirtî

Nalînek hundirê min e şil dilivîne
Hêsireke narîn dirjîne
Awaza xwe bilind kiribû û bang kir:
Kanî ew şiyarbûn ji min gelo?!
Pêlek min dibe û fêrî kovana min dibe
Bi kenê xwe li ser kaban rûdine û kesera min dikşîne
Tu ew deryayî bi pêl û dînbûna xwe ve
Û ez beranberî te bi nalîna xwe  fîxan dikim
Ew soz giyan diarînin
hêl wana vediguhêzînin
 bi şengiya feleka nazdar
Û dike tilîlî bi dagirtbûna vedengê
Mîna awazeke qilûç
Çendîn dixwazim te bibînim
 ey pirtika perwînê di êvareke stuxwar de
Çendîn memikên te dixwazim di nîvê deryayê de dema ew bi hevrîşma xwe me dipêçîne
Di tenahiyekê de rehjen pêxwas dikevin pêşbirkê têne te çelenga min
Sêwîbûna min zordar e
Tenahiya min serhildêr e
Li gulên buxçeyên dûr dinêrin
Kovanên demsalan bi tek awirî têkdibin
Dema tu li min dinêrî ,damarên min dihejin
De bi destê min bigre, bimeşe û van hêsiran damale
Birîna me naye jibîrkirin
Ma temen çiye bê te
Mîna payîzê bi nalînên me dagirtiye

Bi bîranîn û xemsariyê ve
Gerdûnekî bi keserekî cîteng bûye
Birînên qircirê dibêje
De bila ew bedewbûna a ku têde te nexapîne
Di bin siha wê de axîn û keser dikevin e pêşbirkê
Ji bo dêma aştiya a xwe ditewîne desteser bikin
Evînek di hundirê min de dinale
Û ji rojavayê rewrewka te difire
Çîrokên dirêj dibarîne
Ji demeke şîn ve
Tiştek nîne ji bilî tiştê buhirtî
Ji devê te yê tije çîrokên bixwîn dertê
Û siberojek şîva xwe amade dike
Ji bo demborîna dûr nişkavî bike
Û carne berve xewina fereh di giyanê me de diçe
Ji bo xemgîniya me êrîş bike
Têde şahiyekî
Ji derveyî mirina me çêdike
Têde dem bi kefenê re dilanê digerîne.

# Sirûda bangên dûr

Bila ezman di çavên te de mîna guleke ji hêsiran şîn bibe
Bila derbikeve û xwe di nav darên henarkên te de xwe hilkişîne
Û devê xwe vek ji pêşwazîkirina erdê dema roxandinê.
Demsalên xema min li pêş berkenê te yê a ku dilê min dudil dike sema dikin.
De bila çivîkên giyana te hêdîka paş perdeya xeman derbikevin
Ji ber ew penageya min e tebitî ye mîna siha şevê
Were mîna çepelên zaferanê xwe xwar bike
Bêhêviya pêlê birjîne
Herwiha  sistbûna qêrîna beraxaftinê
Di min de deryayên şadiyê maç bike
Û rêjna ewra a ku bi nivişta niqumbûna min bi te ve bihin bike
Şeva min bi sihwe bê te
 de nêzik be
Tariya min jêbibe
Bi ew rehniya a ku ji sermemikê te derdikeve
Henasekêşana min bi henaseberdana xwe ve sivik bike
Di min de vemire
Ji ber ku ez bayê findên te me
Hilma lerzên te me
Xwhdana dînbûna te me
De zêra dilpijînê
Zîva kovanê ji bo min hilîne
Ez destberdana te yê dilpijok im
Mîna şînkayîyek hişbir
li buxçeyên çongên te ez çandî me
Bi bihnim
mîna riswabûna a di navbera deriyên girtî de

derbas dibe
Hesreta te ez ji işkbûneke ku tê rizgar dikim
Gunbedên lêvên te ez radikim
Bi maçekê giraniyên birînan radike
Ta di me de şev û sibeh hevseng bibin
Ji gundên xewina dûr
Ez te awazekî sivik sih razayî li paş girikê werdigrim
Xema me vala dike
Evîna me li ber kaniyekê serjê dike
Va ew xewin di tariya temarê de guh dide me
Agahî dide bi hêrsa kortekê
Va ew meznayî ritm di dilê qurzîkê de diçîne
Wesatbûnê di me de dihejîne
Hêsirên razayî vêdixîne.

# Çavsoriyên Qazmeyan

Ez gelekî bi vekirina bişkokên kurtika te
 kovanbûyî dibim
Ta ez memikên te bibim
li seyranekê
li buxçeyên asîmanên ên di lêvê min de
 niştecî bûn e
Laşê te perestgeh e
û desdanên min narînbend in
Pistepistên te velorandin in
Û xirîngiyên te lava ne
Min fêrî zîndankirina te bike
 di amana hêsirên min in merd de.
Li rex min be
Ez hini ji bajarên xema bêzar hatibûm
Bi min ve mîna stêrekê biterpile
Bi berkenê min re heta sibehê rûne
Di min de êrîşa sozên milhûriya qeşayê ji germahiyê re bike
Bi berkenên xwe yên zelal ve ji nişkê ve were mirinê
Fetisandina hesretên min berdewam bike
Qêrînên min serjê bike
Derdên min bibire
Ji kezeba dilê min ve hemî harbûna qazmeyan derbixîne
Ey vejînê
Zengilê lêbide
li deryayê bêhndanên te de maçên min wenda dibin
şikeftên lerzên me li ser lutkeyên bilindiyê ava dikin
û min wekî zarokekî ji malzaroka rokê re vedigerîne
ewr di giyanê min de bi serhevdû dibin

mîna roniya te cîteng dibin
dema ez balgeha a ku herdû serên me  di şevekê de hembêz kiribû dinêrim.
Di sibeha te de ez hijmara porên te ên ji te ketî amar dikim
Bi rêya wan ez temenê xwe ya mayî bê te dijmêrim.

# Guhmasiya hedanê

Tu qet neaxivî
Tenê bi tiştê ku pişa min dihêle
tendûrek êzing be
Bi dirêjî şevê ve vêketî
Pîvaza rojan
Kertola arezûyê dibrêje
Li te digerim
Bi te re diaxivim
Rehjenên min dewsa dipûşkên demê
vê yekê pêktînin.
Dema ji dûr ve
li benda şopên gavên te dibin
Ew gavên ên xwe li jorî bîrêkirin û gênciyê dibînin
Dilê min bi limêja ji te re mijol e
Di her tîpekê de an gavekê an  kuxikeke rasterast
Di riwê maska Koronayê
 ê hîn li ber deriya devê min fişîn dike
taku ji min re behsa te bike
ey xwedan pora hurhutandî
 bi westandina şengbûyî nemoşkirî
ez te qayilkirin didim niha
 bi bêdengiya xwe ve
bi dilê xwe ve
li peyvên min ên dîwarê deng û mirinê derbaskirin temaşe bikî.
di du xulekan de ez te vedixwînim
tu westandina min bikşînî
dema li ber dînbûna te xwe digerîne
 ji bo li ser dilovan bibe.

ji ber sekinandin bi yek lingî
li ser qeraxa sermaya te
ev wî westandibû
ez tenê bi dînbûna te matmayî dibim
çawa bi xanedaniya birîna min tenik nebû
ez ji salan ve li benda rabûna hevdîtinê me
ez te ji cilê te ji laşê te ger tu bixwazî derdixînim
ji damar ,rih û hestûyên te jî
ji bo tu zikmak bî
û ev jiyan bî bê hevbeşî
bi zorê te ji cilê te derdixînim
taku tu ji mermerekî sipî bedewtir bî
bala çavan bikşînî
ew çavê ê li şaristaniya bêhişiyê dinêre
de li ser wê çîrokê bigre yara min
giyana min maç bike dema jê peyv diforin
ji bo ew peyv hêrsa te bi derziyên evîniyê deq bikin
Çîniyan qet ji bilî min bi serve nebiribûn.
Ez rêza te digrim mîna rêzgirtina zivistanê ji keça havînê re
ew qehweya payîzê venaxwe tenê piştî erêkirinê
Li cem te heval hene mîna teriyan in
hez dikin li gel te çay vexwin
Û pirbêjiyên pîran ji zarokan re bibêjin
Li cem te kar û bar hene
Û li cem min teşqeleyên min hene
Ta bi mirinê re şer bikin
Şerê sarbûnê bikin
Ma evîn çiye eger me ji rewşên me dernexîne
Ma evîn çiye eger me nefetisîne
bi hijmara rojên sal û katijmêrên rojê ve

Ez bi fetisandina te cîteng bûm e
Ez dîlê rehjena te ya westiyayî me
ewê ku şev bi rojê ve girêdide
bê ku min li derve bibîne
Û ez jî li warên xwedê ên fereh mîna şeyalê ê ku ez li xwe diki parseyê dikim
Li te digerim
Li rehetiyê digerim
Li hembêza te digerim
Min bihin bike û ez wê bihin bikim
Dilê min bûye kargehekî
ji bo pêşwazîkirina demsalên dînbûna te
Keberêhekî ji bo nêzikirina beravaftina te her şevê
de limêjê ji bo min bi aramî bike
Taku firişteyên biçûk razin
Mîna dergûşên ên nema mezin dibin
Pêdivî ji qiyametê re nîne
Ji bilî di rûniştinê de
di nav guhmasiya hedanê de.

# Qêrînên di riwê tariyê de

Hemî axaftinên bê hiş xwe dixine qurzîkê
Dema ew qêrîn bi giyanê xwe wan jêdibe
De ew hêsirên asoya berve ketinê têxîne di amadebaşiyê de
xemgîniyên me wan dibêjin.
Di xwîna xwe de ez êrîşa rokekê şewatan di xwe de dihêle
dikim
Û dixwaze ji min ez wê bi berkenê xwe yê zîv rehnî ve talan
bikim
bi xwînçûna xwe ve kêlîkekê ez diponijim
jê hêvî dikim
ku pora zîziya nediyar vexwe.
Wê li buxçe û bajarên xwe vedixwînim
Û lawên tariyê xwe li ser dilê min bicî kirin
Li cem min hêsireke sor hebû û ji min dizîbûn
Rewrewkên xwe yên biyan di xwîna min de nîgar kirin
Berkeneke min e sipî hebû ew kuştin
Laşên gav sicîfbûyî vereşandin
Bi nalîna xwe bihina xwe kişandin
Wan guno kirin
Ew ev dojeh in, keliya wê ne
Fêrî bêhêviyên me bûn
Wê nîgar kirin
keser û bêhişbûna xwe xelatî me kirin
di riwên me de mijol dibûn
wan şeqam kirin.

# Cîhana min e rehnîbûyî

Di çavên te de
Ez erd û ezman dibînim
Dizewicin
Tevderbasdibin
Di hundirê pîvanekê de
Ez te dibînim
Şevekê roj hembêz dike
Heyvekê hema kê bê xwarê
Di fîncanekê de
Xemekê ditirse winda bibe
Û têkeve êgir
Hêsirên bi qasî kendavan dibarîne
Lêvê min bibe
Xwarinekê ji lêvên xwe re
Sorbûnekê ji lêvên te re
Dermanekê ji bo rehetbûna xwe re
ta tu hew bi êşe
Min bibe ji memikên xwe re
Ji wan lutkeyan re
Li wir aramiye
Ez mîna libên pîzotê
li xwelîdanekê de vêdikevim
Dema li dîmenên te dinêrim
Û axaftinên me yên dihû ez dixwînim
Pişa min dibe xwarinekê ji balindeyan re
Û rehjenên min dibin meydana çi derdekî
Ey cîhana min e rehnîbûyî

# Girêka mêyatiyê

Gotinên te di bawişkên xema min de
 rengê davikan awaz dikin
 dema melevaniyê li burcên rehjena min dikin.
Helbestan tînîn
Di çavên xwe de
matmayîbûnên sibehê fereh dibin
De min bihêle ez bihna xwe
 ji hedana daryayêve ve berdim
Bihna rizgariyê di te de bikşînim
Serî hilde mîna maçekê
li ser zendên xwe nalînek dergûş diraje
Hîn di nav hêka zorê de mezin dibe
De min ji her demekê ve derîne
 Ew dem mîna kefenekî ye
Efsana xweşiyê bihejîne
Bi hêsirekê tu wê
Li ser qeyika xêzê dirjîne
Mîna peyveke evîn
 ji kesekî re naye gotin
Tevlî baweriya a ku li ser sehneyekê hatibû kuştin bibe
Ew sehneya bi holên dînbûnê ve dagirtî ye
Destê min burca mizgeftekê ye
Û dilê min zengila qiyametê ye heta hetayê
Ey agir û kefilcan
Xema min lîstok e
 eger ez ji bo te xemgîn nebim

Pêkenok e hêsirê min
eger ez bi desmala hêsirê te jênebim
Hemî cîhan henekek e eger ez nekevim cîhana nû
ji dergeha memikên te ve
Li wir hemî cîhanên evînê
badankên çiraya xwe vêdixînin
Ji bo pêşwazîkirina gerestêrkên ên li dûr te dizîvirin
Ji bo te
Ji te re
Di te de
Ey girêka mêyatiyê ji demeke dirêj ve.

# Li  ser sînora evînê

Gewdeha min e cîtengbûyî ji hezkirina bejina te
Cîgeha çaxleyên te yên sipî ne
Sînga min bi neynûka memikên xwe birîn bike
Ta bibe ji deryayan re derbasgehekî
Ey westiyayê min bihellîne
Tu yê hêsirên min di herdû çavên xwe de
ji nû ve radikî
tu ew kevina nû yî
bi niviştê ve dagirtî yî
li ser sînora evînê
rengê agir li warên te min vêdixîne
wekî ez agirdûya  te bim
ji legnên te re amade bibûm
ji vemirandina te re hatibûm danîn
û pişt re ji vêketina te re
ey dûmahîka hespên resen
min gurbûna maçê çêjkirin bide
min bihêle ez gîha bim
û ew ba wê li erdekî ne li vî erdî belav bike
ji min re gerdûnê bike balîfekî
û ji hembêzkirinekê ve palasekî dirêj bike
esmerbûna min kila herdû çavên te ne
laşê min e tiroyî li hundirê sûra giyanê te ye
netirse
ji laşê xwe ve wî lerzî ji xwe bike
min bibe libekî ji razaneke rehet re
an Marigwanekî ji dînbûna lihevhatî re

ji min bi harbûna pilingên birçî hezbike
wekî dema dawî bermaya xezalekê dicon
bi rêya min rikberiya desthilatiya şeytanokê bike
dîwarên girî û nalînê bişkîne
min bi mestbûnekê ve bixwaze
bi rêya min rikberiya kêliyên bêzariyê bike
lêhilhat bike
ji ber tu siwara min e
a  hînê ji hespa mêyatiyê ve nehatibû  xwarê
û hînê bi dilêrbûn têkoşînê dike

# Wekî ku ez

Deryaya te min dinuximîne
Mîna ku ez guhmasiyekê bim li ser qeraxên wêna
Wekî ku destê te yê rêwî
 mîna leylaneke be  ji sipîbûnê ve serserqot be
Li ser eniya min be
Mîna pêlek diçe û tê
Ez ew guhmasiya nazdar im
Û tu ew deryaya bazdayî ji malbata avê
Sirûda te min dipêçîne
Mîna ku ez xêz bim
Û tu wana ji hibra henaseberdana xwe yê vekişyayî dagirî
Ji derveyî sînorên sermaya dijwar
Hilmên xwe berdide
Û ba henaseberdana xwe li pêş zîndankirin dide
Mîna tu stêrek bî ji jor ve dakeve xwarê
Ta li jorî min barenekî germ bişke
Dema ev yeka bi evîna min ji te re girêdayî be
Hemî dergehên êşê tu di hundirê min de digrî dema tu berken dibî
Xem hemî li pêş kenê te  ji bizdanê ve bazdabûn
Û mey bangewaziya mestbûna te dikin
Dema tu min hembêz dikî
Mîna ku ez derbideriya te ya dirêj bim
Û tu bermaya xewina a ku ji dilê min ve dibe lehî
Mîna tu qerbalixa aramiyeke bê dawî bî
Mîna ku ez çemên ên ji bilindiya guhara te
her şevê tême xwarê

Tu banga min dikî
Bi navê min tu berdiaxivî
Rewrewka te hertimî dikeve payalê
Mestbûna te mîna benekî ji darekî bilind berve xwarê tê
Û dem meymûnekî xwe digindirîne
Di nav me de
Dema em li bendewariyê dimînin.

# Li paş demsalan

Tu ew deryaya germ
a li benda giyanê min dimîne
Ewê herdû lingên wê
ji bilindiya giyanê te ve şemitîn
Û ketibûn e di talîzoka herdû çavên te de
Wisa çîroka niqumbûnê destpê bû
Demsalên te ez xapandibûm
Di navbera zivistana hêsirên te de
û havîna xwestinên te
Eza min e li ser xwe ve girtî mîna siha berûyê
Payîza te ya bi hêrs ji zû ve bang li min kir
Berî şiyarbûna zerbûnê
Ji kurtika xwe ve ji min re roka germ derxistibû
Ew roka kelî mîna kelîbûna lêva min e lêketî bi dîwara
cotmemikên te ve
Buhara te ya sersar
mîna zerika hêkê ji malzaroka kelandinê derket
Mîna çiyakî di rû girikekî repû.
Destê min bi beraxaftina xwe ya dirêj bibe
Ji min re biskên bendewariya min bihûne
Mîna stranekê ji westabûna maçan ve
Li dor min gul bibe
Ji ber pişta te ya a rehniya heyvê
berûvajî dike min belawela kiribû
Bajarên dilê min û gundewarên wê yên dûr belakir
Xwîna lêvan bi paçika lerzan bipêçîne

Di perestgeha laşê min de
mîna dilfînekê ji sêwir melevaniyê bike
De di min de şerê desthilatiya penaberiyê bike
Tirêna a berve leşgergeha mirinê diçe biteqîne
Mirina min bi amadebûna xwe ya pîroz nişkavî bike
Ji bo min artêşên nemiriyê bêne.

# Şiyarbûnek mestbûn

Di te de sirûda gilyazê ne
Dema li ser baskê roka havînê difirin
Bi şivirên tihbûna min tenik bibe
Ji ber ku li ser qeraxên memikên te westiyabûn
Bi berkenê xwe ve pêla tihbûna min e kevinar ramûse.
Zikê xemê bi tîrên awirên xwe ve qul bike
Ez ji stranekê ve derbas dibim
Mîna eyazeke hêçbûyî bi dû deryayên dûr ve diçe
Li jorî bilindiyên sînga te ez diçim
Mîna balindeyekî keskesorî
Di nav xalên laş de xweziyên avê ku bibe agir ez bihin dikim
Li ser kabên te li ser hespên meznayîyê siwar dibim
Dema derbasî mizgeftên êşa kevin dibin
Sosina xunavê ji maçekê bide
Bila bîrêkirinên te yên jibîrbûyî tav bikin
Ji ber ev dûmahîka xemsariyê ye
Hêsira xwe ya bê ol serjê bike
di amana arezûyê de li mala yekem birjîne
bizdana min sêdar bike
ji tenahiya bêzar ve
şadiya min biguvişîne
li ser sînga min mîna xezaleke serjêbûyî jiyana xwe jidest bide
hew salan amar bike
salên ên tu têde mîna pirtûkên kevin
bê min paşguhbûyî mayî

de rabe berve jor û sozên ronahiyê ezber bike
di evîna min de sifrên hevpeymanên şîn pîroz bike
min hemî li xwe bike
mîna ewreke tarî ji zikên xwe ve çizirên pêşveçûnê dertên
çeftelî û enîson li xwe bike
û ji westandinê ve şiyarbûnek mestbûnê bistîne.

# Ji derveyî rehjenê

Jê kêm tê xwarê
Cendek û kavil di eynî demê de
Li ber çavên min ji nişkêve
Bibû jineke orispî
Memikên wê bûn e du reşmar
Goştekî mişkên deştê wêna hew dixun
Û li ser rehnên wê
Cin û bermayê şeytanekî rûdinin
Di rûxiserên wê de mirina min radikeve
Bi çavbirçîbûn ew ji hêsirê min vedixwe
Ji maçekê jehrekî berdide
Giyanê min beravêtî dike
Dipûşk ji devê wê derdikevin
Di nîva zivistanên min in avis de
Nalîn , xem û rewrewk
Çi tiştê di cîhanê de berz dike
Ji çavkarî, mirin û wêranî
Mîna kelereşekî diyar dibe
Cendekên elendê dikevin
Mîna doman û xwîn xwe berdidin
Di xwe de pozbilindiya sextebûnê niştecî dikin
Tirsekî ji rastiyeke  qet najî dijîn
Ji derveyî ku rehjen hêvî dike

# Bêhêvî

Di dilê min de bêhêvî dimre
Ez ageh û têderxistin im
Û ji xeman re dawiyek im
Di giyanê min de pepûkî winda dibe
Di hundirê min de zarokek dijî
Efsaniye di wî de hêzek heye
Cîhanên êşê navê
Di hundirê min de xwe derbas dike
De narînbenda rehjenan bihejîne
De ey henas bistre
Ji her xulekek şewitî
Wê li pey siha wê şahiyek were

# Sînga te mirina dilovan e

Gora min di nav memikên te de ye
Li wir bila min binax bikin.
Di nav memikên te de min bila veşêrin
Bi axa piştçavên te bila min bisetimînin
Bi sipîbûna gewdeha te bila min kefen bikin
Û bila berkena min e zindî mîna şîraniyekê li ser zarokan belav bikin
Û bi helbestên min bila deriyên zengarî buyax bikin
De bila kilîtan bişkînin
Û bi helkolkên hêsirên min gora min e biçûk bikolin
Û eger erda sînga te bi cendeka min ve teng bû
Bila hestî û goşt bidin alîkî
Û dilê min deynin
Û eger erda sînga te bi dilê min teng bû
Bila dilê min li alîkî çekin
Û wêneya min dema ez zarokek bûm di asta yekê a seretayî wergrin
Bila li ser memikên te wêneya min deynin
Û eger erda sînga te bi wêneya min teng bû
Bila bişewitînin
Û dewsa wê helbesta min deynin
Û eger rehjena sînga te bi dilê min teng bû
Bila jêbibin ji ber tu hemî nivîsên min î
De li ser memikên xwe bîranîna maçeke min bihêle
Û eger bîranîn winda bû
Û rondik fetisîn
Ji min re di yek odeyên bîranînê de siha min bihêle

Û ew di şevên barîn de  kuxikê dadimale
Bila tu bi bermaya siha min ve şad bibî
Dema bi gopala salên min e bê oxir
pala xwe dide li ser milê te
Ji min re mirinekî astbilind bihêle
Di giyanê min de rêyekê ji sersaxiyê re saz dike
pirên ên texta zaroktiya min bi goristanê ve girêdide
Û bi mirinê re pistepist dike
Ta bibe evîndarekî
bi bihnekî fereh hijmara hevdîtinên me
 di şevên bi heyv de amar dike
Ma çiqas sal têrî me dikin
Ku em evînê bijîn gelo?!
Wax çendîn şev giran e bê te
Xweda çendîn dûrketin kirêt e
Çendîn qirêj e

# Efsanek penaberbûyî

Ey efsana dilê min e a bi dû serdemên qeşaya sermedî dikeve
Di te de ez êrîşa bilindiya xeman dikim
Bi te ez li ser azanên sirûdê hildikşim
Di te de ez nivişta herdemiyê maç dikim
Were di navbera min û ew kula a mezin dibe dûr bike
Ev xemgînî devê xwe yê sar
mîna reşmara avê vedike
De maçekê bide min
Taku ez ejdeha mirinê qedexe bikim
Ta li ser hestuyên min pif neke
Va ez li vir im li ser zendên te me
Ey dilçûyê
Min bi azadî maç bike
Mîna xwedawendeke çol û hişkiyê kevir dike
Û li ser erdnîgariya piştê min
toza bajarên mijbûyî jêdibe
Ey cîgeha dilê min ji derveyî malzaroka berfan
Berfên ên li jêrên min girên qeşaya agirî dirjîne
Bihêle xemgînî bar bike
Bihêle jibîrbûyî be
Ji min re gencîneyên perestgehê berhev bike
Li ser min keleh,dalan û sedavên qilûç rabike
Hemî çiya li ser piştê min dikin fîxan
Li ser min keviran rabike
Di navbera sînga min û sînga xwe de
agir pêxîne
Mîna hezar qereçiyekê
sema bike

Tîpa min ji te hezdike
 ji dema ku ew ava zelal bibû
Di malzaroka lênûsên xwelîreng de
Hêsira a di navbera riw û çavan de
 ji te hezdike
Ey kovana rojên jibîrbûyî

# Min te dixwest

Ezê dewsa te
giraniyên xemsariya te rajim
Û li ser te tenê tu berken bibî
Min di nav sînga xwe de mîna gerdenek elmas nizm dibe veşêre
Gerdena ku mîna werîsekî hewil dide kesekî ketibûye bîrê destê xwe dirêjî wî bike
bê ku bighe.
Ezê ji bo te temenê te rabikim
Û sibehên te rajim
Bi te ve biçim derveyî mirinê
Min bi zinadên hêsirên xwe ve hembêz bike
Li ser dîwara bîrêkirinê
bineqşîne awaza dengê xwe
ê jiyan û xemgîniyan derbas dike .
di te de aramiyek heye
di çi cih û demê de nîne
ji ber ku tu mêyeke bi hilma xwedê yî
û xwediya gerdûn û gerdûnanî
xwediya giyana min e a bi kenê te avis
ey xwediya zîzbûnê
tu hurgiliyên xunava a rawestiyayî
di hundirê bijkojê de
hilma qerenfîlê yî
rengê gangilokê yî
min te ji kevinê felekê ve diviyabû
ku ez bibama gerdena a li ser sînga te
min diviyabû ku dem bê

taku li gel te biaxivim
bigrîm
berbiaxivim
binalim
min xwestibû
ez li ser kabokên te serdemên bêpariyê biqedînim
min ew bêdengî dikuje
difetisîne
min te dixwest
ey baya vedengê
gula Beybûnê.

# Namebereke lezgîn û nameyek negîha

Destê te yê razayî
li ser destê min
di xewinekê de
liba dibe
mîna alên welatên ku nizanîbûn li paş lawaziyê
serberjêr bibana
bi mestbûn di nav tiliyên min de şehnaz dibin
tiliyên min ên ker, kor û lal mîna evîneke berketî.
Helkelka ewra tarî  di nav pêçiyên me yên tevderbasbûyî
ji maseyên henaseyên me yên
a bi merdiya maçan ve avabûyî ne
Nêzîk dibin
Bihêle mey
sînoran li ser erdnîgariya me ya westiyayî
nîgar bike
Ew erdnîgarî şiliyê nas nakin.
Xuhdana te ya mîna pora avê di livandina qirikêde
min şil dike
Û piştçav hatibûye girtin
mîna gurbûna bilûrekî têkçûyî
Di dema ku waxbûn mîna buxçeyekî
li ser lepê newalekî kûr rijiya
Ey bilindê mîna pêla bîrêkirinê
Min vêxîne
Tariyê ji ser darikên kibrîtên min rabike
Ez xewin dikim
bi neviyên xalên te
yên piştî lehiya me ya daketî xwarê derhatin

Mîna berikan ji darên tunebûnê diweşin
Mîna şahiyeke qereçiyan dibarin
Wekî erebeyên ku hespên kurt dixirxirînin
diyar dibin
Vedenga rê li pey wan dikeve
Keftarên giyanê zengilên berbanga me ya bê dawî hildigrin
Wekî ku peyvên me li deryayê tozê
melevaniyê bikin
Li rehniyekê digerin
Digotin ew reşkuj bûye
Li ser dergeheke zengarî
Xaziyan jibîrakiribûn ku vebikin
Û egîtên wê paşve vegerîn
Wekî ku ew çinîkerên pembûyê bin
Li ser palgehên jibîrkirinê stûxwar daketin
Destê te nameberek lezgîn e
Û destê min nameyek negîha.

# Rêwîtiya helimkêşiyê

Di helimkêşiya te de ez rêwî dibim
Mîna helmekê li ser çunberiya bînvedanê bilind dibe
Û bi dara rehjenê
pezên giyanê birêve dibe
li nav çolan
bi tenê pirtûka evîna te dixwîne
û li nav maçên xwe çibû
li jor baniyên sînga te
windayî ye li çolên gewdeha te
wateya rastiyê nasnake
û baniyekî ji bêwariya domahiyê bernakeve
de bila çivîkên toza tariyê barbikin
bila rabibin li serlutkeya nediyariyê
ew rehniyê li paş çiyê ve dadiqurtîne
bila berkenê te mîna deziyên destpêka berbangê ve
ji pişa şevê ve vekişe
li vir nêzîk newala bîdarê
em qubleyekî ji xewinê re ava dikin
bi cilên keskesorê xwe dixemilînin
û reşiyê ji ser karwanên geşiyê ve radikin
em xemsariyê bi tayê dixînin
û fêrî xwendina hêviyê dibin
li pêş findên mezin vemirandinê vedixwen
mîna berxên ên ji avê xwe ve vedixwin
piştî germahiyeke dijwar
dema roj diçe avan
bi xweşiyê vedixwin
û di dema pevçûna tariyê de rehniyê dikin

dirindeye ev siberoj bê siha te
xwe nîgar dike
li ser dîwarê odeya rûniştinê
dema em rehniyê vêdixwînin
û serê petîlê radibe
riwê te ya bi ken li ser sobiyayê diyar dibe
dema elketrîk qut dibe
em nan li ser aliyên wê yên reş diqemitînin
bihna te jê derdikeve di nîva nanê germ de
merdî belav dibe
dema hemî darên payîza zer digrîn
li ser riwê min legenên êgir pêdixînin
ji hêsirên min ve bîçimên te yên kehr derdixînin

# Dildarî û keder

Çemekî bi rehjena min re dibe dost
Şil e ew dil bi keffa nêdar
Damaran bi nexweşiya bilindiyê dixîne
Ritm çirûskê berve rojavayê
  titmeya min dişopîne
Bi bêdengiyê ve difore
Ji bawişk û çûna li ba xewê
Ji temenê bê hiş re dibêje bese
Li vir gerdûnekî ji dilzîziyê ve
 wê tije qerebalix bibe
Ji dîlanekê ve wateya jibîrkirinê werdigre
Ji nişkêve wê kulên şewatan dagire
Dildar e bi axaftin û maçên nerm ve
Di dema dîdariya hezkirinê
Tiryak ji mestbûna dûrketinê
û dûrbûna wî bêhêvî nabe
Wê di damar de derbas bibe
Bi dagirtîbûna lemlema xwe ve
di nîvê cokê de
Wê mîna timikê be
Lepên wê du stranên ji baranê ne
Û piştçavên wê reşewrekî belek e
Destê wê bi giran re diçe
Ji bo ku hizran talan bike
Ji şopa mija goşegîrî
Di sîdar û teraşa şil de
Ji milê rojavayê ve xişxişa wê diyar dibe
Dilê min paş wê ji nû ve bihna xwe dikşîne

Û ji gulan re
qala evîneke niqûmbûyî xewinyar dike
Di giyanê min de dojehek teng diçe
Bi sivkayî ve berve bilindiyê dimeşe
Û ji çavên min ve eyazekî şîn bazdide
Dengekî dûr difire li cem stêrkan
Ez nîşanekî ji ronahiyê me
Paytexta rohilatinê me
Û li deryaya çargoşeyî
Gemî dişemitin
Ev sih mikûr tê ku ez zaroka wî me
Û ji pêsîrê tariyê ve sosin  derdikeve
Ma ev peyv çima sirûda xwe dalêse
Ji ber çi
Xema wê çiye?
Li pey çi dikeve?!
Ew ritm ji zikê daholan ve derdikeve
Dûrbûna zirav ji neyzekan ve derdikeve
Mîna bêdengiyeke nehêne
Sirûd sivikbûna xwe ji mirinê re dibarîne
Ji pepûkiya rizî re
Mîna nexweşiya belavbûyî
Navan bê hemdî xwe nişkavî dike
Mîna çi ewrekî bi hezar gerdeneke zîvî sêwî bûye
Piştçavan radiwestîne
Lutkeyekê ji dil diweşîne
Giyan cîteng bûye
Şopa dumeqeskê dikeve
Di rojeke barîn de
Ez bibûm hogirê rewana te

Ey kevokê
Ey kotrekoviyê
Ey ez
Û dimeşiyam
Bi dû bejineke mîna xezalê ez ketibûm
Lê ew dûrbûna nezerokî
li pey çi qeyranê ye
Û li paş çi kuştinê ye
dûrketinek e nankor û milhûr e
Û li paş evîna te ey ez
Dilê min e bi êş û windayî
Çi bela xema min e kedî ye
Ew bûye mîna pisîka mala kevin
Li paş buxçeyê axdariyê dike
Ma bela xema min e hêrsdar çiye
Mîna helbestê dinale
Mîna dupişkê ye êşa min
Di qurzîkê de goşegîr e
Leylan e gihîştina min
Li vir tirên di hundirê min de xwînçûyî bû
Rê bang kir
Gote min:
Hemî rawestgehên omîdiyê mirin
Vegere ey bêzariya rê
Agirê zîndanbûyî di xwe de vêxîne
Ey şopa tozê li ser pirtûkê
Dînbûna xwe berdewam bike
Û vekêşe
Xweziyên me xwîn jê hatin
Ey zaroka ewran

Ey pora asoyê
Ez balindeyên berbangê me
Û niqumbûna a ku dinêre
Li lutkeya berferh  û rojavaya hestbûyî
Ezê rehjena xwe di valahiyê de bihêlim
Û bi dû himehima giyanê xwe di feleka beyar de bikevim
Ji ber ku temen evîneke bi dijwarî milhûr e
Û kederekî
Li pêş birînekî kûr digrî .

# Biyan

Gav biyan e
Rastî rê tê
Westiyayî ji tozê ve derbas dibe
Li paş sînorên tazî
Li beranberî mij û morana qeşeng.
Biyan e
Xwe di hundirê min de mezin dibîne
Li cem wî rengê bilûr û awazekî niqûmbûyî heye
Bêdengiya min kefen dike
Li ser destika dergehê siha xwe dadiweşîne
Mîna hilmekê wê bihnê dixapîne
Mîna zarokekî kaxezên xwe diqetîne
Û banga rokê di kenekê de dike
Lê ev jiyan xwe goşegîr kir
Li ser tariyekê
Li ser parçebûnekê qet naqede.
Xweziya min ji nişkê ve xemsar bibû
Ji vê felekê re min xwe xûz kiribû
Rê stranên xwe distrîne
Tariyê dixirxirîne
Sipîbûnê jêdibe
Li ser refên kevokan
Li vir rûnişgeheke
Li wir argonek e
Vedeng bi rengê wê reşewrê re zûha dibe
çûkên me jimêj ve
pirsikên ezmên û keriyên wê oxiriyê jê xwest in
Li helbestvanekî

Li arezûyekî digerin
Li ser qumê darikên xwe dineqşînin
ez mîna sihekî disekinim
li pêş rewrewkê ew sih xwe mezin dike
erza virmoriyê dide
û li ser kendalê cil û bergê deştan belav dike
bermayê sihan in ew heval
stranên asoyê wana rengîn dikin
bîranînên zivistanê wana bi berg dikin
sêwirên bihnê wana hembêz dikin
ew dil in di rehjenê xwe yê rehet de
ew sirûd in , naveroka tariya birîndar in
ew helbest in wekî hêsir û xwîn dirjin
bi tenê hezar bilûr êrîş berdidin li ser min
pişa çêbûyan birîn dikin
aigrekî dev ji dostaniya bi xemgînan re berdide
bang li jînekê dike
meşa xwe sivik dike
kesereke westiyayî derdixîne
ez hewil didim bi hunerê ve
bi dû çûna bilbilan berve daran bikevin
ez hewil didim bibim moranekî
li nav çengên xwe baranê vedişêre
xewinekî dêm winda ez dixapînim
pirtûka narvînê ji bo wî ez daner dikim
wê jiyan derbas bibe
û emê bê wate biçin
çi armanc jê naye
em qurbaniyên hêviyê ne
bermane bi nemanê re agirbestekî

bi rêya xebatê îmze dikin
ew temen mîna sirûdekî ye
piştî wê bêzarî derdikeve
em dudil in
ji kevinê kevin ve em birêve diçin
taku tiştekî ji vê pêkenokê têbighin
û em sersaxiyê li te dikin dilo
sersaxiya çavan dikin
di tênûsên temen de em rewrewkên xwe teqle dikin
em tên mirina rewrewkan piştrast dikin
li serbirxaneya xêzê em wana dicivînin
kurtika tariyê li wan pîroz dikin
li ser nivîna wan em li dîmenekî dinêrin
bi dildariyê emê mirinê li cihê wî de derbas bikin
bi dildariyê wê alozî binax bibin
û ji pistepist re çêja şewatê ye
dev jê berde
xwe ji demborîneke di dema niha de gurbûyî xwe bitewîne
ew bibû rehjena helbestekê
nemiriyê bilêv dike
arezûya şeng û perwer dûbare dike.

# Sirûda gilyazê

Di te de sirûda gilayzê ye
dema li ser baskê roka havînê difire
De bi şivirên tihbûna min nazik bibe
Ji ber li ser qeraxên memikên te westiyabûn
Bi berkenê xwe ve domana tihbûna min e kevinar ramûse
Zikê xemgîniyê bi tîrên awirên xwe ve qul bike
Ez mîna stranekê diçim
Mîna eyazeke agirpêj bi dû deryayên dûr dikevim
Li bilindiya sînga te ez derbider dibim
Mîna balindeyekî keskesorî
Di xalên gewdeha te de
Xweziyên avê bihin dikim
Taku bibin agir
Di nav çongên te de
 li ser hespên pozbilindiyê siwar dibim
Dema derbasî mizgeftên êşa kevin dibim
Bila bîrêkirinên te yên jibîrbûyî birûsk bikin
Ji ber ev domahîka xemsariyê ye
De hêsirê xwe yê bê ol serjê bike
De birjîne di amana arezûyê li mala yekem
Bizdana min ji tenahiya sersar sêdar bike
Şahiya min bigûvêşe
Li ser sînga min mîna xezaleke serjêbûyî jiyana xwe ji dest bide
Hew  salan amar bike
Salên ku tu mîna pirtûka kevin mabûyî bê min
De rabe berve jor

Sozên ronahiyê ezber bike
Di evîna min de sifrên sozên şîn pîroz bike
Min hemî li xwe bike
Mîna reşewrekê ji zikê xwe ve tavên pêşveçûnê dertîne
Şeftelî û yansonê li xwe bike
Û ji westabûnê ve şiyarbûna mestbûnê werbigre.

# Sirûda evîna nû

Di te de ez eniya gulan hembêz dikim
Di memikên te de ez nemiriyê maç dikim
Ez ji te me
Temena min
Û di te de me ez
Damarekî dilê sarbûnê diteqîne
Evîna te çiya ne li ser rehjena min
Dildariya min berf in
Lutkeyan dinixumînin
Û xem di dilê min de vemirî
Ji ber tu gerdûna min î
Ew hebûnayî.
Tu volkanên giyanê min î
Kelîbûna evîn î
Tu agirê min î
Û ez argon im
Hizrê min ji te hezdike
Fişefişa bîrkirinê û ev ramandin jî
berketî hebûna te ne
û dengê te hîn min vêdixîne
wekî ku ew bilûr be
awaza tembûrekê be
wekî tu rêya evînê bî
û ev aso bî
wekî ku ev dînbûn
ji dilê min re vedigere

# Awazekî li ser rayên mirinê

Peyalên hêsiran ji zivistanên xemê min ve
ji nişkêve têne xwarê
li ser zenda birînekî barnekiribû
mestbûna min amade ye
êrîşa li ser bizdana hêsirên min e belavbûyî dike
xweda ji nobedariya min ve bêzar bibû
û bi kûrbûn raza
firişteya bi xwîn nema desmalekî dibîne
taku xwîna xwe yê hatiye xwarê
ji pozê xwe yê xwar rawestîne.
Pakiyek nîne li asoya gerdûnê diyar bibe
Domanekî ji qehfa rojavayê ve derdikeve
Xemgînî ewê lawaz
A rawestyayî mîna dara parsûyê li ser qurzîka dil
Xwedayekî meya a ji hêsirên ne diyar vedixwe
Çi rizgarî ji gurgura dawiyê ve nîne
Ji ber ku destpêk tûrek hesretên qul e
Darbesta bîranînê rewrewkan vedireşîne
Û ji malzaroka xwe ya metirsîdar ve
xweziyên bê dunde berdide
Wêraniyekî sirûda aştiyê awaz sike
Li ser vedengên ûmoniyomê
Û kenekî ji tifika xwe ve marên giriyê dertîne
Ji te ez bê dundiya bêzariyê bihin dikim
Kuxika bizdanê
Fişefişa berkena seqet jî

Û ji bilindiya  min ve ejdeha nemanê şiyar dibe
Bihina xwe derdixîne
Gerdûnekî di nîvê bermîla dîmenên xweş de
melevaniyê dike
Zikbirçî ye ta asta toqbûn û westabûnê
Zorê li ser sirûdên me yên kehr dike
Hêrs piş û gewriya xewinyar didaqurtîne
Û nalîna min tenê goştekî xav e ji meznayiyê re
Û malzarokekî qonaxên mirinê vedişêre
Ji kesên din re rêyekî mirov dibe li netiştekbûnê .
Pêdiviya min bi jinekê ve heye
Xwîna min ji min re bikewîne
Piştî wê Ji aliyê maçan ve vexwe
Li cem tek awirê ez meşextim
Pişt re destê laşên min dibe
Dema baran tûra xwe vala dike
Û heyv û dîmen diwerîne
Pêdiviya min bi dilpijokeke şeng heye
Neynûkên hêsira min dikirtîne
Bi destmala lêvên xwe yên ên bi dilzîziyê ve şil
Bi xemgîniyên min ve dilîze
Pîlanan li ser mirin û bêpariya min durist dike
Û ji kena min re sîmfoniyên bêdengiya
piştxûz rêxistin dike
Pêdiviya min bi dînbûnekê ve heye
Ji mêj ve nehatibû
Taku min bibîne
li ser gunbedên memikên wê nimêjeke bêdawî
Bi wê re sema dikim
Û Ezraîl li me temaşe dike ji qurzîka çengên wê ve

Û Cubraîl ji bo wê palasekî kesk rêdixîne
Evîna me vedide
herkû tarîbûn dijwar bibe
taku bi rêya wê qonaxên min zayîn bibin
û qêrînên xwe ji  salek ta salekî dirêj bikin

# Dema helbest berdiaxive

Di çavên te de jîndarên hilgir
ji kovanê felekan dirazin
reşçavên te ew herdû gerdûnên beranberî hevdû ne
dilê min e bi berga gerestêrkê ve dirajin
ez ewqasiya te ya şeng im
û tu ew çawaniya a giyanê min bi rêk û pêk dike
koçberiya min di asoya te de melevaniyê dike
tu felsefeya min e li çolên sêwira zanistî berdayî
ey gerdûna min e a dewsa gerdûnekî kê hema bête xwarê
di bîrekê de bosta wî 14 milyar salek rehnîbûyî
te ji ku aniye ev bilindî a barana xemên min hembêz dike
li ser baniya hezar gokzemînî
di min de baranekî birje
dilopên wê siberoja deryayan radike
berve devên axên ên ji tiriya hêsirên gulî dimijin
qeşeyê di min de bişkîne
li ser lutkeyên giyana min
fokiyên dirindî dinalin
û betrîq fîxan didin
mîna ku ew ejdeha bin
zinarên volkanî pif dikin
hêsirên min baranên şor in
û hêsirên te masta çokên sersar in
laşên min kongehên erdê ne
û laşên te birûskên misînên zîv in
tu berga ezmanî yî
û ez qatên erda xurt im
de baskên xwe veke

mîna tu mezintirîn sîperekî girs bî
nehatiye erdê ji demekê ve
taku hemî cûreyên balafirên cengî daqurtîne
min bibarîne
tiştê nasbûyî a pûç berde
ewê bi tewşiyên hatibûye çandîn mîna mayînekî
li ser dirêjî sînorên nezaniyê li welatên me
welatên koletiyê
xwatir bixwaze ji hozanyarên çilêçilên
ên li goşegîrên nizm cîgirbûn e
ji ser stêrkan berbejinên tariyê
û efsanên wê yên nehêne daweşîne
wekî tu niha di min de bî û li dor te ew cin pêsîrên çi
cinawirekê dixwe
dimîne şeytana a ji tewanên xwedê bêsûcbûyî
mijangên te dirêxîne
dibe ku karibe raze
û çavên xwe bigre
ji çûn û hatinên leşgerên xwedê ve
ên ji kevin ve kêrên xwe yên sêgoşeyî û zêrîn bikartînin
parsûya nûheyvê
parsûya xaçê
û ew parsûya a ku serê xwe berve dîwêr dihejîne
bi xurtî dinale
bi qêrîna hezar toşebûyê
mîna her carê ez nizanim çawa helbestekê
bi dawî bikim
min parepar dike
min belawela dike
ta min bike cilê qereçiyekê

ez ji te neqetiyam
neqediyam
û naqedim
ey baya dînbûnê û rengê çaman
dema bi azadî berdiaxivin.

# Rêzên perperîkan

Kûr ez ji te hez dikim
Bihna gewdeha te dikim
li nav darên tîr û gelek derbas dibe
Eyaz mîna şevên bê dawî
Hembêza giran dadixîne
Li ser sînga min talîzokên baya te cîgir dibin
Mîna gemiyekê rêya xwe winda kiribû
Bi te ez hindek salan ve efyonkêş bûm
Ji dema ku min hezkirin nas kir
Û bêdengî ez bi xwîn kir im
Min tev kovan û girî kir
Di te de min jiyanê hezdikir
Ez fêrî meşa li ser reşewrê bibûm
Taku te ji lepê ewrekî derxînim
Mîna balindeyekî ji jorî natirse.
Tu şewata peyvên min î
Dema pîzotê li deverên seqemê belav dike
Tu helbest, stran û berîda şahiya lezgîn î
Nivîna me ji guhên kesên din ve dûr e
Lerzên me dengên tavan dadiqurtînin
Û ji her barîna çi xweşiyê ve barana şerpîn derdixîne
Gelo çend stêrk wê ji hembêza me derbikevin
Û ji xalên me zayîn bibin?!
Çend ewr wê sipîbûna memikên te
li ser sînga min bistirin?!
Çend gerestêrk wê gîhaya stêrên çavên te bicûn
Û çend û çend

dema rengê ezman kesek bibe û çûk şîn bibin
Memikên xwe ji qefesa a ku di bin keleha tirsê de maye derxîne
Lêvê min e jêrîn bi lêvê xwe yê jorîn ve bibe
Taku ezman li ser erdê bikeve
Ketina xemgîniyê ji milê şadiyê ve.
Taku stêrk mîna qorên perwînan
li ser sînorên noqê te bimeşin

# Ji dawî dostikekê re

Ji jinekê  re ji min hezkiribû
Û hêsirên xwe wekî diravan ji bo min dabûn
Eger tu bimayî
An te berxwe bida
Dibe ku tu a dawîbayî
Lê ez bi te re me
mîna deqekî li ser milekî birîndar
 rûniştî me
mîna dupişkekî razayî me
li qurzîkekî girover
de min jibîrbike
berdewam dûrbikeve
bila bîranîn biçin kozikê
ezê li vir bimînim
xalekî piştî çi hevokê
bi peyvên dîlbûyî biramim
helbestên min êla min e
û ji bo wan ezê xwîna rewrewka te
ji bo rastbûna êlê birjînim
ey dawî kesên ên ji min dûrketibûn
û ew bi min dagirtî bûn
ey dawî kesê
de tiştê ji ser te geriyabûn daweşîne
maçên min
hembêzkirina min
tozên gavên me
wana bide masî û hutên mezin
piştî min wê tu li jiyanê parseyê bikî

li jiyanekê bigerî tu têde mîrek bî
mîna peykerên cil û bergan wê tu biramî
li demsalek evîn di her çaxê de baran e vekolînî
hewil bidî bîçimên rêjberekê ji xwe bikî
tiliyên arezûya xwe dixînî di şûrbeya germahiyê de
ji bo tu berbikevî ku tu ji çi moriyekî biçûk biçûktir bûye
genima xwe dihêre
û windayî seqet digere
di navbera destayên moriyên gelek de.

# Wekî heyranokek evîn

Di te de ez xwedayê rûgeş
Aştiya kuştî hembêz dikim
Bihna xwe di sînga te de dikşînim û berdidim
Di memikên te de germahiya bayê hênik e
Mîna werîsekî di daristana arezûyê de
 xwe bitewîne
Û hêdîka bimeşe
Rêya min dirêj e
Mîna xişxişekî xwe li ber leylanan digerîne
 diyar bibe
Mîna bîrêkirinekê êrîşê xema roavayê dike
Û li ser qeraxên stranan raze
Mîna heyranokek evîn
Mîna kaniyeke bi sîber
Piyên xwe bêne çoka min
Were em li hola barkirinê bifirin
Min bi evînê ve wekî ol û ramanekî
 hatibûm girêdan
Dilan dihelîne
Hiş talan dike
De were em sîberekî
Û rokekî li rex van buxçeyan hembêz bikin
Perwînên me li asoyan derketin
Li stranên deştan digerin
Herdû giyanên me pîroz dikin
Û stêrkekî bi lez ve dirje digrin.

# Hembêza te welatek din e

Dengê te bilêtek dide min
Bi rêya wê ez welatên gerdûnê derbas dikim
Min ji axdariyan rizgar dikin
Herwiha xema min e dirêjbûyî
Wekî pêlekî di rehjena min  de natebite
Di damarê min de bicî dibe
Di bîçimên te de ewr dimeşin
Kûrahiyên avis di bin xwe de
Bi rewrewk û xewinan ve rêdixînin
Di bîçimên de te gerdûnek din e.
Min têr maçên faşî bike
Mîna payîzek winda
xwe tazî bike
Bihina xwe bi agirpêjiyê bikşîne
Û lerzên xwe berde.
Ey bihina gîhaya kesk
Siha te mîna refên stêrkan berve xwarê tê
wekî baranê ji nêrgizekê ve dibarê
mîna hingivek rehnî
bi kûrbûn dikeve henas de
û dertê
di memikên te yên gulgulî de
Misk û Enber dijîn
Û bi şadî dirazin
Di rehnên te yên gulgulî de
Roniya sor diçê û tê
Di lêvên te yên agirî de
Zater û şidank difûrin

Leylana te min diguvêşe
Mîna xweşava Enenasa zer
Ey rengê mestbûnê di çavên min de
Û qêrîna germahiyê di çeleyê de
Nêzik be
Û sînga min rêxîne
Û bihêle ez di te de
Hemî jinên gerdûna kevinar
 bihin bikim
Û pora xwe lê heyva min rehet bike
Mîna meya di peyalê de berde
Bihêle li rex min xwe berve jêrê here
Mîna werîsekî ji baranekî zîvî
Carne dibe solafek ji şevê
Û carnan dibe zêrîn
Ey hingivekê ji çiyakî tije şaneyên mêşê hingiv dibare
Lêvên te nehêneya çêja şekir e
Mîna temarekê rehjena te min dibe
Ji derveyî qerebalixên rojan
Û bi min mîna xişxişekî rêwî dibe
Min qircira xeman jibîrkirin dide
Riwê te dema rêya min ronî dike
Rehjenên dil dorpêç dike
Bi lehiyên evîna te min dibe
Û bê awaz ji min re distre
Çendîn lêvê te min bi tîrekê ve dike nîşan
Û çavên mirinê armanc dike
Mestbûna min xwe disotîne
Xwe dikewkirîne
Bi taya sînga te ve hêrs dibe

û birûsk vedide
Berxwe dibe
Şiyar dimîne
Dengê te dihêle dilê min mest bibe
Xemgîniya min e bilind biçûktir dike

# Tevdandinên dil

Tevdandinên dil ji bo helbestê
slogan dibêjin
banga mêya azadiyê dikin
riwên rehniyê vedikolînin
xwe bi dildariya jibîrbûyî digerînin
gilêza milhûriyê diarînin
qehfê reşmarê dipelixînin
hesp bazdanê bi dest xwe dixînin
ji axorên tirsê derdikevin
hemî kavilan derbas dikin
ma evîn çiye ji bilî nevêtinê
ji bêparî û şebxwînkirinê ve
es sersaxiya şadiyek jibîrbûyî dikim
û nalînek serî hildayî diarînim
mîna tîxan digevize
lê hêsirên awaza elendê qul dike
li beyarên hestiyariyê dimeşe
tevdandinek dirindî serhildayî ye
di zikê volkanê de dimeşe
ew tevdandin hêdîka bi bêdengî têkdiçe
bi şevpesta demborînê ve
dema niha dixirxirîne
û boriyên sirûdê digre
bi kûrbûn di henas de dinale
ew rehjena kor xemsar e
dihû û tiştê bûyî jibîrnake
westandinek di kûrahiyên min de bicî dibe
di bê ser û beriya rojên min de niştecî dibe

bi asahî niha min dinvîse
û dumeqeska temenê li vir mest e
carne berxew dibe
di çepelên dara banê de dijî
tiştê diyar û heyî hembêz dike
bi zarzarî
nalînên rojên bi xemgîniyê ve avis
diqewitîne
ji hêviyek barkirî
bê hêvî nebe
felek camêr û destvekirî ye
dibe carne me matmayî bike
mirinekî paşxîne
an ji pencereya me ya bi çûk ve temenek nû bide
rehjenek neman nabe
eger xwestina wî hertimî
rizgarkirina mirovan be.

# Kazîna bilûran

Agirê cegerên xemsariyê sirûd dikin
Li ser perdên wê bizqê.
Darbesta xewinan hildigrin
Bi avê re diaxivin
Û di sermayê de qulkekî vedikin.
Li ser şala berfê laşên bihinkêşanê nîgar dikin
Bermaya nalîna min ji xwedê re rêdikin
Li ser dûrbûnan
Ew arezûya nezan xwe dirêj dike
Her axdariyekê dibarîne
Ez bi dû refê kenê wê dikim
Wekî ku rok ji keziyên wê derketibe
Di nalîna min de leylana wê ya lawaz şad dibe
Hinek kêliyan ew pistepist dike
Li nazikiya maçeke dûdil digere
Li ser êvara jibîrbûyî dimeşe
Hilma wê hêsir û xwîna min e
Di bin siha wê de ez xewina xwe dijîm
Û çêja lêvên wê li ser lêvê min dimeşe
Ey dosto
Tu bi min re gotûbêjê dikî
Û di çavên te de leylana berbangê
bi baldarî derdikeve
Û di peyvan de bilûr peyda dibin
Bi rehjena me re bi xemsarî diçin
Me dûbare dikin
Û bi seyrbûn  digrîn

# Babilî ye

Li ser şaxê dilê min
Mîna perwîneke zêrîn sekinî
Ji nişkêve hatibû min
Û ez di nîvê jibîrkirina xwe de bûm
Û dilê min di temara xwe de
ji balefireke kaxezî siviktir bibû
Hat taku damarê min endezyar bike
Kabika dildariyê li ser bilindiya hêla rastê ji dil
nû ava bike
Perestgehên perestiya hişmendiyê
li ser deşta rehjenê min lêbike
Û stranên sermediyê dilorîne
Babilî ye
Felek li pêş min azar kiribû
Bi dengê maçeke gulî .
Alîkariya rengên aviz dikir
Taku piştî beravêtinekê rengên din e geş derbixîne
Memika wê ya bi rehnî
heyvgiriyê li ser tiliyên min berûvajî dikir
Û dibû sipî û zîv
Memika wê ya din
heyveke din e
Pir bi rehnî ye
Tariya çileya zivistanê
bi dilçûn didarqurtîne
Ji nivişta wê Harût û Marût
vejîn bibûn
Û mîna du mûmya

ji devê Enekûndeke hov derketbûn
Çi bilûr nîne ji bilî dengê wê
Dilên kevirên reş û zincîrên hesinî şikestî dike
Çi agir ji bilî agirê dûrbûna wê nîne
Qeşayê li herdû cemseriyan dihelîne
Û berfê mîna siloriyê li ser çiyayên xurt vêdixîne

# Ey hemî binî berfan ji lutkeyan

Mêya min
Hemî roj li pêş dîtina rehniya te dev ji karên xwe berdan
Li paş sînorên berêvarê vekişiyan
Dema te dîtibûn girsbûnek ronavêj
Hemî roniyên xwe kome ser hevdû kirin
Û biryar dabûn barbikin
Va ez li vi rim
Li ser qeraxên zinnaran
Bi şengiya tîrêjên te ve dema jiyanê hildigre
 ez mest dibim.
Mîna dema qeşmerekî lîstokekî ji pembû digre
Û pê dilîze bi qasî hunera a ku têde husteye
Va te aliyê rokê guhêrand
Du rokên nû ji rojavaya herdû çavên te ve
 ji nişkêve derketibûn
Te rengê heyvê guhêrand
Dema ji te derketin
Mîna du heyvên ji herdû memikan ve
Ewên Rehniya gerdûnê hembêz dikirin
Ma ez ji derveyê wan çi dikim?!
Gerdûn tarî ye
Daristanên tîr bajarên mezin daqurtandin
Û qircira berê barkir
Ez ji te pêve ji dola evînê nabînim
Hêrsa xwedê li ser jiyanê bi berkenê xwe ve
tu vedigerînî
Ez te nabînim ji bilî ku tu keça xwedê bî
Ji tovên hêsirên min tu hatibûyî afirandin

Ez ji bilî dêmê te nabînim
Ew mirina min
Cenga dawî
Û qiyametê li paş dixîne.
Bizdana hatibûye weşandin
mîna pelên darê
ta demeke din ve li paş dixîne.
Evîna te neqşeya xemsariya
a ku kombûye diqetîne
Mîna koleyên çerxên kombûyî
li pêş dergeha êşê dimîne .
Dihêle ez kovanên xwe
radestî çîrçîra pênûsê bikim
De destê xwe yê kor bide min
Taku bi serve navendên êgir li dor dilê min bibe
Ez rehjena xwe di evîna te de volkanekî dibînim
Û dilê min mîna deryayek kelî ye.
Tariya min bi rengên giyanê xwe ve
sêtav bike
Belko şev ji reşiya xwe ve
xwe rût bike
Û çavê xwe bigre
ji tiştê ku ez hest dikim ji mîvroya wî
De birje baranekî
Li ser temamî bîrêkirina min
belav bibe
Mîna perwînên girs
aniha derketibûn
Taku ji gîhaya maçên me ên hatibûn e paşxistin
li piştî hevdîtinê biçêrin

Mîna gerdenek elmas belav bibe
Sextebûnê kedî bike
Û şansek bidêkî
taku ji sextebûna xwe vegere
Tiştan ji windabûna xwe bi min ve
rizgar bike
Li asoya berfereh ez windayî me
Ey hemî binê berfan ji lutkeyan
Ey evîna min e derbasbûyî serdemiyê.

# Bibe ji ezmanê min re binbanek

Baya bîrêkirina te min diraje
Li serbirên xweziyan
Pişa xema min qulbûyî
mîna eyarşîrkekê dihêle
taku bi pergala berkenê te ve
ji min re derkeve
dema sengerên mij û moranê derbas dike
li ser pesarên deştên me
debdebeya dilşikestinê bilind radibe
taku banga mexzûvaniyê parçe bike
ji mestbûna te yê çûyî re
bihinberdanên min xwe ditewînin
ji baya sar ve penaber bibû.
Felekek vemirî
radibe ji bo piştgiriya mixabîniyeke xwar bike
Bê wate tihbûnê bi qumê avdide
Û ji kelekela nîvrûyê re kenarekî çêdike
Û ji zuwabûnekî re buhiştek saz dike
Ji min deyne dêma xwe ya sar
Û bihêle ez biçim bi sêwira xwe yê fereh ve
Ligel jinekê bi min ve bicihbûye mîna te
Nêzik te hêviyekî miyew dike
Û valahiyekî kalîn dike
Min bi ewrên riwê xwe yê li ser reşewra gindirî dagire
Û barke cem min
Nêrgiz min li berve te bi rêve dibe
Û bi dû min tê li ser rêya berfîn
Mîna ku ez kalîskek bim

şemitandina wî westandibû
Û bibû li ber çavê Betrîqan
Mîna golika avê ji sermayê ve hatibû xwarin
Mîna ku ez bayek bim ji cîhana bavlîsokan ve veqetiyayî
Û bi eyazê re bibû yek
Di evînê de bi yek tîpekî seqet nepeyive
Û lêvên xwe mîna rêyek xwar xwar neke
An mîna tirênekî ji rêza xwe derketî
Bi reftarên bêdengiyê rabibe
Mîna her kevinarekê
Mir û nizanîbû ku hêsirên wê ji ber evîndariyê hatibûn xwarê
Û dema çivîk ji qefesa sîng ve derdikevin
Mîna rehjenên germ
Ji bona wê sifreyên çavgirtinê
û beraxaftina rehjenekî saz dibe
Û vexandinên bêdengiyek bê bêdengî
Ji bo hêja bibin kovanekî ji te
Çûyîna ji çerxek ta çerxekî
Meşa serdeman li ser çax û dîrokên pîzotê
Taku mîna her carê tu bibî ji birîna mestbûna min re av û meyekî
Ji amarkirina rondikên min têkneçe
Ên  ji weşandinê dûrketibûn
Û diman di çavan de zîndankirî
Bibe kaniyên tagirtinê
Dawiyan di kûrahiyan de awaz dike
Bibe ji ezmana min re binbanekî
Û ji seqema jiyana min re golên rohilatinê
Ji hebûna te ya ase re di devê nemanê de
Wateya stranê ye

Û wateya nêzikbûna ji şadiyê re
Ji bo wêneyekî pêre bikşîne
Berî ku di berêvarê de bar bike
Di mayîna te de di hundirê maçekê de
ji westandinê derketî
Ew encameke ji rabûna bê re
Di te de ez şadiyê distînim
Di zîzbûnên rehjena te de
ez her axînekî bilind celew dikim
Payîzê dişînim dadgeha baranê
Û di zîndana helbestê de wî dihêlim
Tiliyên min e birçî li ser erdnîgariya te
Tola xwe ji nezaniya wê ve hiltîne
Û nemiriyê di cûtmemikan de maç dike
Yasmîna sipî li ser maseyên herdû sêvên te belav dike
Çîrokên evîna volkanî dirêsîne
di dema hembêzkirinekê de
û li ser tabloyên sor de efsanên dildariyê dineqişîne
elfebayekê ji çokên niştecî re
li ser deştên gewdeha te de diafirîne
û ji kevoka kozel re
a ku ji hilgirtina nameyên aştiyê newestabû.
Pêxwas ji lingên te ve xelxala qircirê direve
Li ser çirûsîna holê mozîrk vêdikeve
Fîstana te ya bi semayê re
rengê tevderbasbûna heyv bi dar ve werdigre
Lêvên te li ser hemî peyalên vala nîgar dibûn
Çavên te mîna du kevokan
li ser sînga çi petîle û çirayê rabibûn
Û dilê min ji bo wan rût derdiket

Li ser vedenga daholekî rabibû.
Û nalîna bilûrekî  laşên xeman dixirxirîne
Taku wana çebike
Li ser çemekî ji xweliyê

# Mirinekî paşxistî

Leylan di berbangê de mirarî dibin
Dema germahiya destên te maç dikin
Mîna deziyên zîvî xwe berdidin
Taku xema alindeyê nîşan bikin
Bi tîpên dîlber ve dilîzin
Noqa asoyê birîn dikin
Palpiştên xewinan dihejînin
Hingemeya temenekî çûyî
sersaxiyê jê dixwazin
Ji dilê melûl re peyvên ji kesera hensas re
pêşde dibin
Ji te re giyana min dema çeman dirjîne
Ji te re dilê min dema baranan dibarîne
Bila berbang di çavên te de bijî
Ez jiyanê hemî jiyanê
Wekî maçên ku ji lêvên te derdikevin dibînim
Ji lutkeyên mîna memikên te germtir nînin
Xewinên min in yekem bilind dibin
Şahiyên min hevdû hembêz dikin
Welatê min e yekem
Welatê min e xanedantirîn
Dilê te ye
Ez mîna zarokekî şeng herdem dijîm
Li ser zendên te
Di hembêza te de
Di te de ez li wateyekî digerim
Ji ew beza ku mirin wî disekinîne
Û di te de ez li wateya ramanekî digerim

Bêdengî ew westandibû
Bimîne sermayekî di kûrahiyên min de
Hebûna min bi wate ye di te de
Ezê mirina xwe ya misoger paşbixînim
Bi mirina xwe ya xweş di çavên te de

# Li ber gora rokê

Di dema ku ez li dûr memikên te  dimînim dema lerizîna zivistanê di me de
Xalên erdnîgariya te amar dikim
Mîna kesê ku di şevê de stêran amar dike
Û berî tu hêsirên xweşiyê ji dijwariya pêxurînê ve bibarînî
Ji serdayiya dengê xwe ve ez du stêrkan vêdixînim
Dema tu lerz bi lerzê ve dudirûyî
Heyv şikestî tê xwarê
Mîna parçeyên elmasê û ji nişkêve
Li ser erdnîgariya pişta te yê zîvî
Taku bibin hurbîniyên xwehdanekî rehnîbûyî
Diçirise
Dilop dilop dirje
Li bajarên nemiriyê
di te de derbas dibe

# Tîpa min te niha dibîne

Bi derbasgehan tiştê ku nabin ez derbas dikim
Û ji sawêrê hebûna te ez wekî mînakekî werdigrim
Taku pêdiviyên têçûna te li cihekî piştrast bikim
Li cîhanekê ku miqrisiyê ji kesên wendayî mîna min dike
Berî tu hilat bibî.
Hebûna te mîna tabloyekî jihevketî li ser rêya teng têrî min nake
Axdariyê dike û jê camên bêhêviya hûr derdikeve
Ezê ji tunebûnê re bibêjim
Li ser hurbiniyên kovana min
 a li erdnîgariya sawêrê niştecîbûyî.
Bi evîna xwe ji te re ezê pêla deryayên dijwar celew bikim.
Ezê dengedenga bêçêriyê
 di riwên xwe yên melûl de serjê bikim
Li rex dergehên bendemana zirxdarkirî
Ji dûr ve ezê gavên te yên sergiran bibhîsim
Banga sawêrê bikim.
Pîroz be ji wî re
ew hebûna a ku sînora serguhayîbûnê
derbas dikir
Tenaziya xwe bi komên ên bîçimên Kafka
Nîşanên Elmeerrî
Tenaziya Dûstofîskî
Û kenê Şopînhûr dike.
Û siha min e tenazok a bi ken
Matmayî bûye
di nîvê komên riw û bîçiman de.
Ji bona te artêşên bihinkêşanê kom dibin.

Hemî ji bo nîgarkirina bîçimên te yên zigurd beşdar dibin.
Û ez li valahiyê dizîvirim
Li talîzokê melevaniyê dikim
Di rabûna xwe de winda dibim
Û erd di rûniştina min de li min teng dibe
Ez boriyan ji hêsir û hesretan re vedikim
Ji derveyî ramandina bi te ez xwe nabînim
Tenê mîna sirûşekê koçka hestbûnê derbas dike
Ez te di henasê xwe de henasekî dibînim
Û temenekî temena min bi cil dike
Û bi gerdenpêçana xwe ya a bi hilman ve şil rawestgehên jiyana min dinuxumîne
Ji felekek ta felekekî ve tu berken dimîne
Mîna tabloyekî bilind
Çengên xwe berve çar aliyan dirêjkirî
Şîndariyê tu xelatî deştan dikî
Û bilindî didî çiyayan
Û tu sîtav, çem û deryayan diyarî avê dikî
Û li paş te ve yên mîna te
Wekî miriyên ku dimeşin berve rizîbûnê
ve her diçin
Tu ji nûjenbûnê gelek nûjentirî
Nivişka efsanê yî
Serşîra destanan î
Û şana çîrokên evîndaran î
Ji bo te min dil da
Û ji bona te ey keça xemlîneyê
Bi min xweş dihat gurandina sexteyên ku xwe wekî te dikin
Pîroz be ji tîpa min re
Ew niha te dibîne

# Jiyangeriya Rêber Hebûn

- Ew Rêber Adil Ehmed e
- Rojbûn 02. Mijdarê. 1987 li bajarê Munbicê- bakûrê Sûrî.
- Zimanê Erebî li zangoyê Helebê xwendî ye.
- Ji sala 2015 ve li Elmanyayê ye.
- Dameznerê malpera Kombûna zanyarên azad e ji bo weşandina pirtûkên Elkitronî.
- bi herdû zimanên Kurdî û Erebî dinivîse.
- Gelek gotar û xwendinên xwe yên belavbûyî hene di hin malper û rojnameyên Kurdî û Erebî de .

- Endamekî berê bû di komîteya rêvebir de a yekîtiya rewşenbîrên rojavayê Kurdistanê .
- Endam e di yekîtiya nivîskar û rojnemavanên kurd Sûrî.
- Dameznerê navenda Dûsseldorf a rewşenbîrî ye.
- Pêşkêşvanê bername zanyar bi zimanên Kurdî û Erebî bi rêya Zoomê ve.

Berhem

Di helbestê de:

- Dîwana Qêrînên roniyê bi zimanê Erebî 2016.
- Dîwana Qêrînên roniyê bi zimanê Kurdî 2020.

- Dîwana sirûda Gêlasan bi zimanê Erebî 2023.

Di pexşanê de :

- Leylan û nerîn bi zimanê Erebî 2017.
- Narînbendên Kurdistanî bi Pinar Kobanî re bi zimanê Erebî (hevbeş) 2019.
- Rewrekên xwînî bi zimanê Kurdî 2019.
- Leylanên xwe dixun bi zimanê Erebî 2023.

Di çîrokê de :

- Mikûrhatinên mest bi zimanê Kurdî 2023.

di romanê de:

- Erdhej bi zimanê Erebî 2023

Di rexneyê de :

- Jihevekirina simbûl di romanên Helîm Yûsiv bi zimanê Erebî 2020.
- Kilîtên nivîsa bi bandor v bi zimanê Erebî 2023.
- Bi kûrbûn binivîs e bi zimanê Erebî 2023 .
- Rabûna afirandinê bi zimanê Erebî 2023.
- Çawa tu nivîskarekî rastîn bî bi zimanê Erebî 2023.
- Kanî ew nivîskarê rastîn bi zimanê Erebî.

-Di ramanê de :

- Evîn hebûn e û hebûn zanîn e bi zimanê Erebî 2021.

-Pirtûkên ku bi awayekî Elkitronîk ve hatibûn e weşandin:

- Nîşanên li paş deqê di cîhanên Mehmûd Elweheb – xwendinên rexnî – bi zimanê Erebî.
- Vedengên dilsariyê – Helbest -bi Erebî.
- Leylan- Deq, bi Erebî.
- Qêrînên roniyê- Helbest- bi Erebî.
- welatekî û jinekê- Helbest- bi Erebî.
- Tilîliyên pênûsekî ji agir- nivîsên Elkitronî- bi Erebî.
- Ramanên biqircir- Hevtayî- bi Erebî.
- Zanyar – Guftûgo- bi Erebî.

-Di warê wergerandinê de :

- Pirtûka helbestvan Ismaîl Ehmed,Evîn kernevalekî xwedayî ye.

-Di warê amadekirina pirtûkan de :

- Xwendinekê ji dîmena siyasî re li rojavayê Kurdistanê.
- Efrîn berxwedana serdemê
- Barîn Gerdena Zeytûnê
- Tundirewî

Di rojname û malperan de:

1. li ser weşandina rojnama Evîn hebûn e û hebûn zanîn e de xebitî.
2. Gelek gotar,lêkolîn û xwedinên rexnî û ramanî ên wî li ser gelek rojnameyên pelgî û Elketronî û malperan hene.

https://reberhebun.blogspot.com/
https://reberhebun.wordpress.com/
reber.hebun@gmail.com

- **Destana min**
- **Helbest**
- **Rêber Hebûn**

**Weşanên Rêber Hebûn**

**reber.hebun@gmail.com**

**Hejmara çapê:99 Berçele 2024**

**ISBN:** ***978-91-89288-90-4***

**KOMBÛNAZANYARÊNAZAD"**

**LÎNKA WEŞANXANEYÊ:**

**https://reberhebun.wordpress.com/**

**NAVENDA MALPERÊ:**

**https://kulturforumdusseldorf.wordpress.com/**

**MALPERA RÊBER HEBÛN:**

**https://zanyaran.wordpress.com/**

**BLOGGER:**

**https://reberhebun.blogspot.com/**



Dema rengê ezman kesek bibe û çûk şîn bibin
Memikên xwe ji qefesa a ku di bin keleha tirsê de maye derxîne
Lêvê min e jêrîn bi lêvê xwe yê jorîn ve bibe
Taku ezman li ser erdê bikeve
Ketina xemgîniyê ji milê şadiyê ve.
Taku stêrk mîna qorên perwînan
li ser sînorên noqê te bimeşin

978-91-89288-90-4